

Hewla însakerdişê edebîyatê bajarî

Hikayeyanê Evdî Hesqera de mîyanê trajedî û komedî de dengeyêk esto. No zî bi mîzah û ironî viraştö. Pêro hikayeyanê ey de mîzah sey kerraya qirni ca gêno. Bi mîzah trajedî nêdano vîr ra kerdiş û pey goşî kerdiş û kerra nêno aye ser o. Bi mîzahî hem melankoliya xesenayê... **Welat Ramînazad / R.9**



Ji bo ziman 20 hezar îmze kom bûn

Roja 22'ê sibatê bi daxwaza zimanê kurdî bibe zimanê fermî û perwedeyê ji alî Tora Ziman û Çanda Kurdî û Platforma Zimanê Kurdî ve kampanyaya îmezeyan hat dest-pêkirin. Heta niha bi awayekî online 20 hezar îmze hatine komkirin û kampanya dewam dike... **R.11**



xwebûn

5- 11 NÎSAN 2021 HEJMAR: 68 BUHA: 5 TL rojname@xwebun.org

Ne lihevkerin ferman e

Heta niha 74 ferman bi serê gelê êzidî de hatine û êzidî niha jî bi fermaneke nû re rûbirû ne. Piştî peymanê di navbera Bexda-Hewlerê ya di 9'ê cotmeha 2020'î de hatibû îmkirin, xetereya li ser Şengalê her çû zêdetir bû û bênavber gefan li gel dixwin û vîna gel nas nakin. Lê gelê êzidî û kurd bi biryar in ku rê nedin peymanên ku wek fermanan tî amadekirin... **R.6**

Kulîlkê geş bike jehrî neke

Li baxçeyê kurdî kulîlkê biçîne bila geş be jehrê lê neke bila hişk nebe! Demek e di nav mala kurdî de hestiyarî, hêrs û bertekeke weke şîne heye. Malîyên wê jî hev sar in, aciz in bi hêrs in. Gelo çima? Bêguman çavkaniya vê bêyomî, fitne û fesadî, dek û dolabên dijmin û neyaran, dagirker û mêtîngeran, nemerda û xêrnexwazan in. Ji bo têgihîştina vê kahîntî ne lazim e. Hinek hestiyarî, çand, bîr û bawerî; dilsozî û welatperweriya kurdîni bes e! Mîna ku zilm û zordariya dagirkeran ne bes be, kurd jî bi hev re mijûl dibin. Gelo nayê dîtî ku gelê kurd di bin nîrê dagirkeriyê de dinale. Tu heyaman bi qasî vê serdemê bi rûmet û kerameta kurdan nehatibû listin; nixê wan nehatibûn binpêkirin. Wisa bûye ku li her çar aliyê welêt serdestên zilimkar bi awayekî bêşerm û bêrûmetî hebûna kurd jî nîqaş dikin... **Mem Avba / R.6**



Hê jî kurdan înkâr dikin û tune dihesibînin

Li dadgehê nehiştin Berdevka Demî ya Tevgera Jinên Azad (TJA) Ayşe Gokkan bi kurdî parastina xwe bike. MED-DER'ê ji bo balê bikişîne ser zextên li ser zimanê kurdî li Amedê daxuyani da. Hevseroka MED-DER'ê Şilan Elmas Kan diyar kir ku ev helwesta dadgehê tê wateya înkâr û tunehesibandina kurdan lê kurd dê li hemberî zextan têkoşîna xwe bidomînin.

Jîrbûna jinan

Mixabin, me gelek gotinên wiha yê di çirokan de derbas dibin ji mîran bihîstine. Gelo mîr ji bîr dikin ku yê ew afirandine, yê ew bi pêşîrê xwe mijandine, ji qeda û belayên dinyayê parastine, yê ew perwerde kirine jî jin in, jin bi xwe ne jiyane? Jiyan ne xweza ye? Nexwe kê ev zagon ser û bin kiriyê û jin kirine bindest? Gelo çima ev yek nayê dîtî? Nexwe mîr jî nizanin ku jîyanê jin bi rê ve dibin û eger jin bixwazin di hemû qadên jîyanê de dikarin bi ser bikevin... Rojêkê, jin û mîrek, bi hev re dikevin gengeşeyê. Mîrik jinan biçûk dike, kenê xwe bi aqilê wan tîne, wan nezan dibîne... **Yasemîn Elban / R.2**

Romana Hehecîkê

Min berê çend berhemên Îrfan Amîda xwendibûn; berhemên wî baş bûn bi kurdiyeke zelal nivîsibû. Min bi mebesta ku ez ê careke din bi kêfxweşî bixwînim, çêjê edebî jê bigirim û hevwaterên hêja bi dest bixim, dest bi xwendina romana Îrfan Amîda ya bi navê "Derî Vekirî Bihêlin Wê Hehecîk Vegerin" kir. Rûpela yekem ji serî heta dawî teswîr, rûpela duyem, rûpela sêyem, rûpela çarem, pêncem heman teswîr bûn. Lê teswîrên çawa? Gotin li pey hev hatine rêzkirin, çemandin, komkirin, qûçkirin. Waterên peyv û hevokan nayên fêmkirin. Gelek peyv di ciyê xwe de nehatine bikaranîn... **Amed Tigrîs / R.5**

Tecrîd di kîjan qanûn û hiqûqê de heye?



Girtiyên siyasî li dehan girtîgehên bi armanca tecrîda li ser Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan were rakirin û zextên li girtîgehên bi dawî bibin, nêzî 140 roj in di greva birçîbûnê de ne û komên nû grevê dewr digirin. Parlamentera HDP'ê ya Êlihê Feleknas Uca mijara tecrîda li Îmraliyê bir rojeva meclisa Tirkiyeyê. Uca di pirsnameyê de xwest ku wezîrê dadê pîrsa 'tecrîd li gorî kîjan qanûnê ye' bibersivîne... **R.3**

Kelecana 4'ê nîsanê

Her sal bi boneya 4'ê nîsanê salvegera rojbûna Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan ji çar aliyê Kurdistanê bi hezaran kes berê xwe didin gundê Amara ya navçeya Xelfetî ya Rihayê. Endamên malbata Ocalan ragihandin ku li benda mêvan in û Mehmet Ocalan got ku ji xeynî dewletê kes ji bo pîrozbahiya rojbûnê xirecirê dernaxe... **R.3**

Şîrîkatiya gunehan

Parzemîna Ewropayê xwe weke navnîşana demokrasî û azadiyan bi nav dike. Helbet aliyekê vê yê rast jî heye. Di encama têkoşîna bi sedê salan a civakên ewropî de, di milê jiyana 'social' de hin destkeftî hene. Civak bi rêya sazî û dezgehên xwe heta radeyekê vê 'social'iyetê didomîne. Lê di milê dewletan de demokrasî û azadî bi tenê weke reklam tî bikaranîn. Ew dewletên giregir gav bi gav xwe ji qada 'social' vedikişînin... **Ramazan Olçen / R.6**



Nivîsîna bi zimanê qedexê

Nivîskar Dilawerê Zengî pirsên rojnameya me bersivandin û diyar kir ku salên berê li Rojava nivîsandina bi zimanê kurdî pir dijwar bû û her kes newêribû bi zimanê qedexekirî binivîsîne... **Hevpeyvîna Rizoyê Xerzî / R.4**

Dadgehê bi bêedaletiyê bersiv da

Di 14'ê Hezîrana 2018'an de parêzvan û zîmên parlamenterê AKP'ê İbrahim Halil Yıldız li navçeya Pîrsûs a Rihayê êrîş biribûn ser malbata Şenyaşar. Di êrîşê de 3 ferdên malbata Şenyaşar hatin kuştin û kesek jî ji malbata Yıldız miribû. Dadgeha Cezayê Giran a 3'yan a Meletiyê biryara xwe ya der barê dozê de aşkera kir. Dadgehê 37 sal û 9 meh ceza li Fadil Şenyaşar birî. 18 sal ceza jî li Enver Yıldız birî. Di êrîşa hatibû

kirin de Haci Esvet bavê Fadil Şenyaşar û birayên wî Celal û Şenyaşar jiyana xwe ji dest dabûn. Malbata Şenyaşar nêzî mehekê ye li ber Edliyeya Rihayê çalakiya 'edaletê' li dar dixê û dadgehê bi vê biryarê ve nîşan da ku bêalî nîn e û alîgirên hikûmetê ne. Dayik Emîne Şenyaşar bertek nîşanî biryarê da û got ku ev edaleteke çawa ye êdî nikare li ser vê axê bîjî û dê mala xwe bar bike û biçê... **R.3**

Seyadê dilê guhdaran bû

Dengê wî qet ji bîra min naçe: "Yêrîvan xeber dide..." Dilê wî tije kerem û dengê wî nêçîrvanê hestên germ bû. Şahidekî zindî yê dîroka 50 salên derbasbûyî bû mamoste Kerem. Di rojên xweş de xebatkarê doza rewşenbîriya kurdî bû. Bi dehan zana û nivîskar, dengbêj û hunermendên kurd bi rêya wî ketin stûdyoya radyoya Êrîvanê: axivîn, stran û newayên xwe li hemû Kurdistanê belav kirin. Rêya Teze bi gotarên wî dewlemendiya çanda me kir malê dîrokê. Qada xebatê di şertên herî giran de neterikand û bi awayekî dûrbînanê dizanî ku rojên xweş jî dê bîn... **Kaşkar Oremar / R.11**

Jîrbûna jinan

Jiyan ne xweza ye? Nexwe kê ev zagonê ser û bin kiriye û jin kirine bîndest? Gelo çima ev yek nayê dîtin? Nexwe mêr jî nizanin ku jiyane jî bi rê ve dibin û eger jin bixwazin di hemû qadên jiyane de dikarin bi ser bikevin



Yasemin Elban

Mixabin, me gelek gotinên wiha yên di çîrokê de derbas dibin ji mêran bihîstine. Gelo mêr jî bîr dikin ku yên ew afirandine, yên ew bi pêsîrê xwe mijandine, ji qeda û belayên dinyayê parastine, yên ew perwerde kirine ji jin in, jin bixwe ne jiyane? Jiyane ne xweza ye? Nexwe kê ev zagon ser û bin kiriye

û jin kirine bîndest? Gelo çima ev yek nayê dîtin? Nexwe mêr jî nizanin ku jiyane jî bi rê ve dibin û eger jin bixwazin di hemû qadên jiyane de dikarin bi ser bikevin...

Rojekê, jin û mêrek, bi hev re dikevin gengeşiyê. Mêrik jinan biçûk dike, kenê xwe bi aqilê wan tîne, wan nezan dibîne.

Jinik dibêje:

-Mêrik, wer nebêje, eger jin bixwazin dikarin bi aqilê xwe deh dek û dolapan bigerin, tu mêr jî nikare bi wan.

Mêrik dibêje:

-Aqilê jinan hingê aqilê çûkekê ye, ew bixwe çî ne, aqilê wan çî ye, dê dek û dolabên wan bibin çî?

Jinik car din dibêje:

-Mêrik wiha nebêje, tu yê bi dû re poşman bibî ha!

Mêrik dibêje:

-Ne hêza we heye, ne jî aqilê we!

Jinik car din dibêje:

-Mêrik tu yê li gotinên xwe poşman bibî ha!

Jinik çî dibêje, çî dike lê mêrik li ser yeka xwe danekeve xwarê. Dortira rojê mêrik radibe diçe ku zeviya xwe cot bike, gava dest bi cotkirinê dike û kotana wî axê diqelêşe, dibîne ku masiyek ji bin axê derdikeve, mêrik diheyire û karê xwe didomîne. Dêna xwe didê ku yeke din jî derket, yek- dudu-sisê, dest bi berhevkirina masiyan dike. Heya cotkirina zeviye diqede, mêrik nêzî du kilo masî berhev dike. Masiyan dixê tûrekî, danê êvarê wexta diçe tûrê masiyan dide destê jina xwe û dibêje:

- Jinik, min ev masî ji nav zeviye berhev kirin. Sibe êvarê ji me re bipêje, li berê savarekî jî bipêje em bixwin.

Jinik bêdeng masiyan ji destê mêrê xwe digire û radike. Şev di ser wan re derbas dibe, sibêdahî mêrik dîsa diçe zeviye cot dike. Danê êvarê cot diqede, vedigere tê malê û dibêje:

-Jinik, ez pir birçî bûme, masiyan bîne em bixwin.

Jinik her wekî ku nebihîstibe, diçe tebaxek tîrşik, tebaxek savar û tasek dew datîne berê. Mêrik li tîrşikê dinêre û dibêje:

-Jinik, ka masî, bo çî te masî nepehtine?

Jinik diheyire û dibêje:

-Masiyê çî?

Mêrik dibêje:

-Ew masiyên ku min duh anîbûn.

Jinik dibêje:

-Te masî ji ku anîbûn?

Mêrik dibêje:

-Min ji nav zeviye kom kiribûn.

Jinik dibêje:

-Mêrik ma te aqilê xwe xwariye!

Masi li nav zeviye çî dike?

Mêrik dibêje:

-Jinik, min dîn neke, nayê bîra te ku min duh da te?

Jinik dibêje:

-Naxêr, masiyê çî halê çî?

Mêrik ji hêrsan dîn û har dibe, pehînekê li xwarinê dide, xwarin tev li nav malê belav dibe. Bi dûv re çovekî digire destê xwe çiqas xwedê quwet dayê li jina xwe dixê. Jinik dike hewar û gazî zarok tîr xwe diavêjin ser diya xwe, mêrikê çavsor li zarokan jî dixê. Gundî hêl û hewara wan dibihîzin û tîr hewara wan, heft mêr bi destê zorê mêrik zeft dikin. Piştî ku hinekî aram dibin. Muxtarê gund li jinikê vedigere û dibêje:

-Xêr e, keça min, ev çima li we dixê?

Jinik dibêje:

-Qet nepirse xalo, hatiye ji min re dibêje: "Min duh li nav zeviye masî berhev kirin û anîn dane te, te çima nepehtiyê û dananiye ber min." Li ser van gotinan gundî tev dikenin. Mêrik li jina xwe vedigere û dibêje:

-Keçê min duh êvarê di tûrekî de masî neanîn nedan destê te?

Jinik dibêje:

-Te masî ji ku anîbûn?

Mêrik dibêje:

-Min ji nav zeviye kom kirin anîn!

Jinik bi çavên şaşo maşo li gundiyan dinêre. Li ser vê yekê, mêrik dîsa dîn dibe û êrişî jina xwe dike. Gundî, xwe didin ber jinê, bi zorê ji destê wî xelas dikin. Lê dinêrin ku mêrik aram nabe, radîbin wî bi kursiyekî ve hişkin girê didin. Muxtar li jinikê vedigere û dibêje:

-Wer dixuyê ku wî aqilê xwe çeliqandiye. Ez ê cabê bidim bajêr, bila bîr wî hildin bibin tîmarxaneyê. Gundî qenet pê tînin ku êdî ew nikare zirarê bide jin û zarokên xwe, tev belav dibin diçin li ser kar û barên xwe. Piştî ku mêrik bê deng dibe, jina wî dest û piyên wî vedike. Sibêdahî mêrik dîsa diçe cot. Wexta êvarê tê malê, jinik tebaxek tîrî savar dike û datîne berê, lê masiyên pehtî di bin savar de vedîşêre. Mêrik, kevçiyekî li savar dixê, masiyan dibîne, ji tîrsan vediciniqe û ji jina xwe re dibêje:

- Jinik zû were dest û piyên min girê bide, vaye ez dîsa dîn dibim.

Jinik dikene û dibêje:

-Mêrik tu meraqan meke, rehet rehet masiyên xwe bixwe, ev masiyên ku te ji zeviye anîbûn ew in. Mêrik bi ecêbmayî dibêje:

-Tu çî dibêjî jinik?

Jinik bi awayekî bixwe bawer lê vedigere û dibêje:

-Mêrik, tê bîra te min ji te re gotibû tu yê li gotina xwe poşman bibî, ne?

Mêrik diheyire û dibêje:

-Çawa?

Jinik dibêje:

-Roja beriya ku tu biçî zeviye cot bikî, min du kilo masî stand û min ew birin di nav zeviye de binax kirin.



Têkoşîna jinan bê sînore

Navenda Nûçeyan

Bi biryarnameya serokkomar, roja 20'ê adarê Tirkiyeyê xwe ji Peymana Stenbolê vekîşand. Piştî vê biryarê, bi gelemperî jin û bi taybetî saziyên jinan, gelek saziyên sivil û partiyên siyasî li dijî vê biryara ji nişka ve derketin. Gelek daxuyanî hatin dayîn û çalakî hatin kirin.

Peymana Stenbolê peymanekê navneteweyî ya mafê mirovan e ku mafên jinan li hemberî hemû cure tundî û neheqîyan diparêze. Peyman di sala 2011'an de ji aliyê 45 welat û Yekitiya Ewropayê ve hat îmzekirin. Tirkiya welatê yekemîn bû ku ev peyman îmze kir.

Ji bo jinan girîngiya peymanê çî ye, Tirkiya çima xwe jê vekîşand, wê ji niha şûn de çî bibe yan jî çî bê kirin? Me ev pirs ji Endama Komîsyona Jinan a Baroya Amedê parêzer Çiğdem Sevîmlî pirsîn û wê jî tîkildarî mijarê nêrîn û nixandinên xwe bi me re parve kirin.

'Sedema vekîşînê polîtîk e'

Parêzer Çiğdem Sevîmlî destpêkê diyar kir ku Peymana Stenbolê mafê jinan hem li derve hem jî li malê diparêze û wiha got: "Peyman jinan ji her cure tundiyên fizîkî û psîkolojîk diparêze û berpirsiyariyên hiqûqî li ser dewletên îmzekar ferz dike."

Sevîmlî destnîşan kir ku sedema

vekişîna ji peymanê polîtîk e û wiha domand: "Meclisa Tirkiyeyê ji mêran ava bûye. Meclisa ku qanûnan çêdike bi piranî mêr in, ji ber vê jî ew nikarin tişteki baş ji bo jinan çêbikin."

Sevîmlî bi bîr xist ku desthilata heytî 19 sal in li ser dîn siyaseta dike û tevî ku wê bixwe peyman îmze kiriye, niha dibêje Peymana Stenbolê malan xira dike. Sevîmlî anî ziman ku ji bo wan jinên ku mafên xwe diparêzin malan xira dikin û wiha got: "Dibêjin

bila jin lê malê rûnin, nexebetin, bîndest bimînin. Lê jinan ev yek qebûl nekir. Ya dîn jî gotin Peymana Stenbolê gel dikeşîne ser LGBTI+yan. Ji bo wan mirovên LGBTI+ sîddar in. Tirkiya li ser wan gotinan xwe ji Peymana Stenbolê vekîşand. Peymana Stenbolê ji bo mafên jinan gelek girîng e."

'Berpîrsyarî hat xespkirin'

Parêzer Sevîmlî anî ziman kir ku serokkomarê Tirkiyeyê bi tena serê



xwe nikare xwe ji peymanê vekîşîne û di nav hiqûqa navxweyî de qanûn çawa hatibe qebûl kirin, bi wî awayî dikare bê betalkirin û wiha domand: "Di nav hiqûqa navxweyî de peymanên nawneteweyî û qanûn yek in. Dîsa di hiqûqê de qanûn bi qanûneneke din dikare bê betalkirin. Wexta ku Peymana Stenbolê hat îmzekirin meclis û lijneya wezîran bi hev re qebûl kirin. Ji bo ji peymanê bê vekîşandin, divê ewil ew qanûn betal bibe. Ji vê re dibêjin prensîba paralel. Ji xeynî vê, di vekîşandinê de xespkirina berpirsiyarê heye ji aliyê hiqûqa îdarî ve. Welatê ku xwe ji peymanê vekîşîne, piştî sê mehan encam dide. Yanî dîsa nabe ku aliyek tenê betal bike. Jixwe Yekitiya Ewropayê ji ber xespkirina berpirsiyariyê belkî qebûl neke."

'Dewlet dibe şîrkê sîc'

Parêzer Çiğdem Sevîmlî herî dawî da zanîn ku Peymana Stenbolê her çiqas bi awayekî baş pêk nedihat jî, ji bo jinan û kesên mexdûr hêvî bû û bi saya têkoşîna saziyên jinan bi awayekî pêk dihat û wiha got: "Çawa ku tundî bê sînore, têkoşîn jî bê sînore. Vekîşîna ji peymanê tê wê wateyê ku dewlet destê dide tundiya li jinan tê kirin. Dewlet bi vî awayî dibe şîrkê mirina jinan û tundiya li wan tê kirin ango dibe şîrkê sîc. Lê belê em dibêjin ku jin wê tîbîkoşîn û li vê peymanê xwedî dervekin ku mafên jinan ên bingehîn ên jiyane diparêze."

Acizbûna xwe bi daran, kêfxweşiya xwe bi gulan tîne ziman



Jina bi navê Şervîn Elo ya 24 salî ji gundê Umero yê Şeraya Efrînê ye û ji dayikbûnê ve napeyive. Piştî dagirkirina Efrînê bi malbata xwe re koçber dibe û berê xwe didin gundê Maratê yê navçeya Ehdas a Kantona Şehbayê. Şervîn ji 7 saliya xwe ve dest bi wênesaziye kiriye û niha mamosteya wênesaziye ye û 8 xwendekarên wê hene. Şervîn li ruxmê ku nikare biaxive hest û kêfxweşiya xwe bi xêzkirina wêneyan tîne ziman û tu caran xwe kêman nabîne û bi hewldaneke mezîn xweşîkbûnê dixê nav jiyana xwe. Dayika Şervîn Elo, Hemîde Mihemed tekdarî hunera keça xwe axivî. Dayikê diyar kir ku dema keça wê 7 salî bûye gelek bi meraq nêzî wêneyan bûye û xêzkirina wêneyên keça xwe bi van gotinan tîne ziman: "Şervîn zêdetir rûyê mirovan xêz dike û ji wan nîvî rûyê wan derdixîne pêş. Ji ber li gorî mîze kirina Şervînê her mirov xwedî du rûyî ye, yek baş e û ya din jî xirab e loma Şervîn her rûyê baş xêz dike û rûyê xirab xêz nake. Wêneyên xwe bi komirê xêz dike. Her wiha Şervîn dema aciz dibe daran dema kêfxweş dibe jî gulan xêz dike." **ŞEHBA**

Kelecana 4'ê nîsanê; malbat li benda mêvanan in

Her sal bi boneya 4'ê nîsanê salvegera rojbûna Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan ji çar aliyê Kurdistanê bi hezaran kes berê xwe didin gundê Amara ya navçeya Xelfetî ya Rihayê. Dewleta tirk gelek caran astengiyan derdixe lê girse li dijî hemû astengiyan diçe gundê Ocalan. Heta niha bi sedan kes hatin binçavkirin, bi sedan kes

birîndar bûn û di 4'ê nîsana 2009'an de Mustafa Dag û Mahsûn Karaoglan ji aliyê hêzên dewleta tirk ve hatin qetilkirin.

Li aliyê din, bi salan e wek kevneşopiyekê ji bo 4'ê nîsanê li gelek deverên Kurdistanê dar tîr çandin û ev kevneşopî dewam dike. Îsal ji bo rojbûna Ocalan kurtefilmek ji hat

amadekirin.

Malbata Ocalan îsal jî li Amarayê amadekariya pêşwazîkirina mêvanan dike. Birayê Ocalan, Mehmet Ocalan bi lêv kir ku di 4'ê nîsanê de li benda mêvana ne ku bîn Amarayê û wiha got: "Dibe ku dewlet şewbê bike hincet û asteng bike. Lê yên ku dixwazin bîn bila tevdirên xwe bigirin û wisa bîn.

Divê dewlet astengiyan daneyne ber mirovan. Ji xeynî dewletê kes li vir xirecirê dernaxe. Li tu devera cîhanê kesek 22 salan nayê girtin. Berpirsiyariyên komplogeran mezin in. Serok bandoreke mezin li Rojhilata Navîn kiriye. Dixwazim 4'ê Nîsana îsal bibe sala aştiyê. Bi hêviya serok azad bibe û aştiyê bê Rojhilata Navîn."

Tecrîd li gorî kîjan hiqûqê ye?

Navenda Nûçeyan

Girtiyên siyasî yên ji doza PKK û PAJK'ê girtî ne, di 27'ê Mijdara 2020'an de, bi armanca bidawîkirina tecrîda li ser Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan ku 22 sal in li girtîgeha Îmraliyê ya Tîpa F a Ewlehiya Bilind girtî ye û binpêkirinên mafên mirovan ên li girtîgehan zêde bûne, dest bi çalakiya greva birçîbûnê ya bêdem û bidorveger kirin. Çalakiya girtiyên siyasî ku koma 26'ê emîn dewr girt, zêdetirî 130 roj in dewam dike.

Li Kampa Penaberan a Mexmûrê, jinan di 18'ê kanûna 2020'an de li dijî tecrîdkirina Ocalan çalakiya greva birçîbûnê da destpêkirin. Çalakiya ku li Komeleya Malbatên Şehîdan a Mexmûrê dest pê kir, zêdetirî 109 roj in didome. Penaberên ku li Kampa Lavrîo ya Yewnanistanê dijîn jî ji bo piştgiriya çalakiya greva birçîbûnê ya li girtîgehan dewam dike, dest bi çalakiya greva birçîbûnê kirin. Grev zêdetirî 90 roj in didome.

Parlamentera Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) ya Êlihê Feleknaş Uca, tecrîdkirina Ocalan bir rojeva meclisa Tirkîyeyê û ji bo Wezîrê Dadê Abdulhamîd Gul bibersivîne pirsname da meclisê.

Uca anî ziman di axaftina telefonê ya kurt de, der barê tenduristiya Ocalan de nebûne xwedî agahî û wiha got "Îzolasyon civakî û muameleya heyî hatiye asta îşkenceyê. Li gorî xala 3'yemîn a Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê îşkence hatiye qedexekirin. Li gorî xala 17'an tecrîd îşkence ye. Tecrîdkirina Abdullah Ocalan a zêdeyî 20 sal in li Îmraliyê didome, li dijî hiqûqa Tirkîyeyê û peymanên navdewletî ye."



Bi mehan e li girtîgehan ji bo tecrîd û zextên li girtîgehan bi dawî bibin çalakiya greva birçîbûnê hatiye destpêkirin û didome. Parlamentera HDP'ê mijara tecrîdê bir rojeva meclisa dewlet tirk û pirsra tecrîd li gorî kîjan qanûnê ye ji wezîrê dadê kir

Uca bal kişand ser rapora CPT'iyê ya 20'ê adara 2018'an û wiha got: "Hemû girtiyên li Îmraliyê tîr girtin, divê bêyî astengî û dereng bi malbat û parêzerên xwe re hevdîtîne bikin. Li gorî biryara Meclisa Parlamentariya Konseya Ewropayê ya 24'ê çileyê 2019'an CPT ji bo tecrîdkirina Ocalan bi dawî bibe pêşniyar kiribûn. Tirkîye hişyar kiribû."

Uca ji bo Wezîrê Dadê Abdulhamîd Gul bibersivîne ev pirs pirsîn:

"* Çima piştî 3-4 deqîqeyan telefona birêz Ocalan û Hamilî Yildirim a

bi malbatê re qut bû? * Ji bo der barê tenduristiya birêz Abdullah Ocalan de agahiyek biewle û teqez bê girtin dê malbat û parêzer bi Ocalan re hevdîtîne bikin?

* Tu aliyê hiqûqî yê tecrîdkirina birêz Abdullah Ocalan û girtiyên din ên li Îmraliyê heye ya na? Li gorî kîjan xala Destûra Bingehîn tecrîdê pêktînin?

* Ji bo tecrîd bi dawî bibe tu hewldanên we hene?

* Li gorî hiqûqa navdewletî çima parêzer nikarin bi birêz Ocalan re hev-

ditîne bikin? * Ji 2'yê gulana 2019'an heta niha parêzer çend çaran çûn bi Ocalan re hevdîtîne kirin û çend caran hevdîtînen wan hatin redkartin. Birêz Ocalan heta niha çend caran bi malbatê re hevdîtîne kiriye?

* Ji bo Tirkîye bang û hişyariya Meclisa Parlamentaran a Konseya Ewropayê li ber çavan bigire tu hewldanên guhertina zagonan heye ya na?

* Li gorî hişyarî û daxwazên CPT'yê ji bo bi girtiyên re hevdîtîne bikin tu hewldan hene ya na?"

Rojnamegerên dîl serbest hatin berdan

Danişîna doza nûçegihanên Ajansa Mezopotamyayê (MA) Adnan Bîlen û Cemil Ügür, Zeynep Dûrgût, nûçegihana Jin-Newsê Şehrîban Abî û rojnameger Nazan Sala yên ji ber çêkirina nûçeyên îşkencekirina 2 welatîyên li navçeya Şaxê ya Wanê ji helikopterê hatin avêtin, pêk hat. Di encama danîşînê de rojnamegerên girtî Bîlen, Ügür, Abî û Sala bi şertê kontrola edlî serbest hatin berdan. Rojnamegeran di parastina xwe de diyar kir ku bi vî dozê re rojnamegerî tê darizandin. Danişîn taloqî 2'yê tîrmehê hat kirin.

WAN

Dadgehê 37 sal û 9 meh ceza li Fadil Şenyaşar birî

Di doza malbata Şenyaşaran de dadgehê 37 sal û 9 meh ceza li Fadil Şenyaşar birî.

14'ê hezîrana 2018'an, parêzvan û xizmên parlamentere AKP'ê İbrahim Halîl Yildiz li navçeya Pirsûsa Rihayê

êrişî malbata Şenyaşar kiribû. Di êrişê de 3 ferdên malbata Şenyaşar û kesek jî ji malbata Yildiz jiyana xwe ji dest dabûn.

Roja 2'yê nîsanê Dadgeha Cezayê Giran a 3'yan a Meletiyê li Fadil Şenyaşar 37 sal û 9 meh û li Enver

Yildiz 18 sal ceza birî. Emîne Şenyaşar ku hevserê wê û du kurên wê jiyana xwe ji dest dan, tevî kurê xwe Ferîd Şenyaşar ê ji êrişê bi birîndarî rizgar bû li ber Edliyeya Rihayê bi daxwaza "edaletê" çalakiya xwe ya nobedê nêzî mehekê ye dewam dikir.

Dayîk Emîne Şenyaşar a li nobeta "Edaletê" biryara dadgehê bihist, wiha bertek nîşanî biryarê da: "5 kurên min hebûn 2 ji wan kuştin, yekî jî kirin girtîgehê. 37 sal û 9 meh ceza lê birin. Yê qetlîam kir, 18 sal danê. Ev edalet, ev dewleteke çawa ye? Li vî welatî edalet tune ye, em ê ji van deran herin. Em êdî li van deran najîn. Kê zarokên min kuştin? Kê diwarên nexweşxaneyê bi xwîne sor kir?" **RIHA**



Rojnameger Buldan hat bibîranîn

Edîtora Rojnameya Rojeva Medya Evîn Bûldan a di 2'yê Nîsana 2017'an de, li Amedê qeyrana dil derbas kiribû û jiyana xwe ji dest dabû, li ser gora xwe hat bibîranîn. Malbat û hembûyên rojnameger Bûldanê, di salvegera mirina wê ya 4'ê emîn de li ser gora wê ya li navçeya Gevera Colemêrgê bi biranîn. Di biranînê de pankarta "Em te ji bir nakin" hat vekirin. Dayika Evîn Bûldan Nesîbe Bûldan di biranînê de axivî û wiha got: "Min Evîn mezin kir lê elxaqê xwe ji hevalên xwe girtiye. Hewce ye ku em xwedî li xeyalên wan derkevin û xebatên wan bidomînin."

COLEMÊRG

Redkirina parastina bi kurdî bir rojeva meclisê

Li Tirkîyeyê qedexe û zextên li hemberî zimanê kurdî berdeham in. Parlamentera Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) a Amedê Semra Guzel rewşa Berdevka Demî ya Tevgera Jinên Azad (TJA) Ayşe Gokkan a mafê parastina wê ya bi kurdî hat redkirin bir rojeva meclisê. Guzel, têkildarî mijarê peşniyazpîrs pêşkeşî Wezîrê Dadê Abdulhamîd Gul kir. Parlamentera Guzel pirsra "Redkirina parastina kesên dixwazin bi zimanê dayîkê xwe biparêzin, binpêkirina maf nîne?" kir. **ENQERE**

Derz li diwarên bendavê ketin

Bendavên "ewlehiyê" yên ku Karên Avê ya Dewletê (DSİ) li herêma Bajaroka Hîlal û Siyahkayayê û li gundê Înceler, Robozik, Kiror, Nêrweh û Şiwêtê çêkirine, piştî zirareke mezin dan ekolojiyê niha jî bûne gef li ser jiyana mirovan. Bendava ku di sala 2009'an de li ser Robarê Robizikê yê ji gundê Înceler û Bêjûhê heya Bajaroka Hîlalê diçe hat çêkirin, par temam bû. Ji ber ku diwarê bendavê deriziyê, av ji derzê diçe û jiyana 4 hezar kesan di talûkeyê de ye. **ŞIRNEX**

Dewlet gefan li malbata Sunbul dixwe

Li gundê Qeregivişê jî navçeya Qereyazî ya Erziromê, hin kesên xwe wekî "polisên îstixbaratê" didin naskirin malbata Sunbulê nerihet dikin. "Polisên îstixbaratê" hefteya borî 2 caran telefonî bav Farûk Sunbul kirine û jê xwestine kurê xwe Farûk Sunbul ku der barê wî de bi îdiaya "endamtiya rêxistinê" biryara girtinê hatiye dayîn û 20 sal in li Ewropayê ye, bîne welêt. Her wiha heman kesan ji bo radestkirina her du keçên wî yên PKK'yî jî "alîkarî" jê xwestine. Keça wî Turkan Sunbul dema ji nexweşxaneyê derketiye polisên heman daxwaz ji wê jî kiriye. Malbatê bertek nîşanî polisên da. **ERZIROM**

LI BER DESTÊ WÎ HÎNÎ AWAYÊ KAR Û XEBATÊ BÛM Şagirtê dibistana Osman Sebrî me

■ Rizoyê Xerzî

Em vê carê li pey şopa hin navên ku bi tîpên zêrîn di dîroka wêjeya kurdî de hatine nivîsandin ketin û me dîsa berê xwe da Rojava. Der barê bîranînên bi Osman Sebrî, Seydayê Tîrêj, Rewşen Bedirxan û hin mijarin din de me ev sohbet bi nivîskar Dilawerê Zengî re kir.

Tu dikarî ji kerema xwe behsa çîroka xwe ya nivîsandina bi kurdî bikî, kengî û çawa dest pê kir? Her wiha helbesta te ya yekemîn kengî hat nivîsandin û çî bû?

Di sala 1977'an de, min dest bi nivîsandina helbestan kir. Ez li ber destê dayike welatparêz û bavekî miletperwer mezin bûm. Ewana akameke (bandoreke) pir mezin li jiyana min a nivîskarî û ramyariyê kir. Hezkirina kurdîyê di dilê min de çandin. Di wî warî de, gelek cefakêşî û dijwarî ji bo min kişandin. Bandora şêxê welatparêz û miletperwer Şêx Sedredînê Bavê Kal (dostê bavê min bû) ji pir li min hebû û li ber destê wî fêrî nivîsandin û xwendina zimanê kurdî bûm û bi alîkariya wî min her du helbestvanên gewre Cegerxwînê nemir û Seydayê Tîrêj nas kirin. Helbesta pêşî ku min nivîsand bi navê Ey Felek bû. Heta bi vê rojê jî min ew helbest nedaye belavkirin. Sedema nebelavkirina wê helbestê jî ev bû: Min bi çavêkî pir tarî li dinyanê dimezand. Ji ber vê rewşê min navê helbesta xwe kiribû Ey Felek. Bi rastî felek li serê min geriyabû. Ez xortekî 16 salî bûm, barê malê ket ser milê min û xwêya malê ji min hat xwestin. Ji bêçareyî min berê xwe da bajarê Şamê. Li wir min têkoşerê gewre Osman Sebrî nas kir.

Te gelek salan têkilî bi rêzdar Osman Sebrî re daniye. Tu dikarî ji kerema xwe behsa wê têkilîyê û serboriyeke xwe ya pê re bikî?

Ji sala 1983'an heta bi roja koçkirina wî, têkilîyên me her berdewam bûn. Seydayê gewre Osman Sebrî (1905-1993) dostê bavê min bû, mamosteyê min ê ziman û nivîsandina pexşaneyê bû. Mamosteyekî rastgo, zana û pir mîr bû. Serê xwe jî dijimînê xwe re neditewand. Bêguman, haveynê mîranî û zanebûnê bi hev re di mirovekî de li hev nagerin û ne tîr meyndin. Rêzgirtin û mezinahiya nemir Osman Sebrî ji ber van her du xalan tê; ne tenê navekî di meydana têkoşîn, xebat û şer û cengan de geş û navdar e. Lê belê, mirovekî zana, rewşenbîr û nivîskarekî gewre ye. Ango, ne mirovekî normal e. Li ber destê wî ez hînî awayê kar û xebatê bûm. Rola O. Sebrî di miştomalkirina behre û berhemên min ên wêjeyî û ra-

manî de balkêş û sereke bû. Bi serbilindî dibêjim: Ez ji şagirtên dibistana O. Sebrî me. Li vir serpêhatiyek hat bîra min û avendeyê gotinê ye. Helbestvanekî kurd bi zimanê erebî helbest dinivîsandin. Pir xwe qure û pozbilind didît. Her bi zimanê erebî û hunera xwe hilkêş bû. Li Şamê bû mêvanê min, ji xwe Seydayê Tîrêj jî mêvanê min bû. Ji min xwest ku em bi hev re herin mala Apê Osman. Em bi hev re çûn. Piştî silav û bi xêrhatinê helbestvanê me dest bi xwendina helbesta xwe kir. Dema helbesta xwe bi dawî kir, bi qurnazî jî apê Osman pirsî: Apo te helbesta min çawa dît? Apo bi bêhneke fireh û piştî çend hilim ji çixara xwe kişandin lê zivîrî û got: Birazî! Çiqas teba li dinyayê hene her yek nêçîrê ji xwe re dike, tenê taji ji xelkê re dike.

Ji kerma xwe hinekî behsa seydayê Tîrêj bike, te bi wî re jî gelek têkilî daniye?

Wek min got, di destpêka xebata min de, Şêx Sedrî ez bi seydayê Cegerxwîn û Tîrêj dam naskirin. Ji sala 1977'an heta bi roja koçkirina wî têkilîyên me bi hev re hebûn. Di hûnandina helbesta kurdî de pir piştevaniya min kir û mamosteyê min bû. Ewî navê (Dilawer) li min kir û pêşgotina diwana min a yekemîn (Pêdarî-1985) nivîsand û helbestek pir heja diyarî min kir. Bi rastî pê re min nemerdî nekîr, tevaya berhemên wî ji tîpên erebî veguhastin tîpên latîni û pêşgotin ji wan re nivîsand (Xelat, Zozan, Cûdî, Mewlûda Kurdmancî û Serpêhatiyên Kurdan) û bi destên min hatin çapkirin. Kesayetiya Seyda mirovekî pir bi danûstandin, civatxweş, dilovan û zimanxweş bû. Bandora wî li civakê baş hebû û nemale li xortên nûhatî gelek hebû. Bi mezinan re mezin bû û bi biçûkan re biçûk bû. Têkilîyên me sînorên mamoste û şagirtiyê derbas kiribûn. Em bûbûn heval, dost û birayên hev.

Te çawa Rewşen Bedir-Xan nas kir û heke dikarî ji kerema xwe behsa serpêhatiyêke xwe ya balkêş bi wê xanimê re bikî?

Rewşen Bedir-Xan (1909-1992), di sala 1987'an de min ew nas kir û her roja pêncşem û îne ez li mala wê bûm. Ew ê jî roleke pir baş di warê wêjê, hezkirina kurdîyê û kar û xebata min de kir. Wê ez wek lawekî xwe peji-randibûm. Bi rastî ez hînî gelek ji serpêhatiyên jiyandî kirim û heta bi vê rojê di bin bandora wan gotin û pendê wê de mam. Ji min re digot: Lawê min! Peyayên malbata Bedirxaniyan bextê (şensê) wan di jiyandî de pir kêr bû. Ji wî tovê ku çandin negihan ku jê bixwin. Ew mirovên pir li pêş bûn, lê milet negihabû. Ez ji Celadet bi şenstir im. Ji ber ku ewî xort û keçên kurd ên xwende-



Peyayên malbata Bedirxaniyan şensê wan di jiyandî de pir kêr bû. Ji wî tovê ku çandin negihan jê bixwin. Ez ji Celadet bi şenstir im. Ji ber ku ewî xort û keçên kurd ên xwende-

van bi çavên serê xwe nedîtin. Bi keda xwe şad nebû, lê bi sedan xort û keçên xwendevan û zana îro li dora xwe dibînim. Lawê min! Tu xortekî di xebatê de pir germ î û te qedera xwe bi malbata Bedirxaniyan ve girêdaye. Wek çawa şerê wan ji hêla mirovên dixok dihat kirin, weharenge wê şerê te jî bibe. Riya te dirêj û dûr e. Bi bêdengî karê xwe bike. Ji karê xwe neweste. Divê hilma te fireh be. Kê çî got li wan venegerîne. Ez bawer im dem keffî e ji bo rastiyê. Divê tu hevalê yekitiya kurdan bî. Nebe sersebebê parçebûn û dûrketina kurdan ji hev. Bila tu berê keda xwe di jiyandî de nexwî, lê wê dîroka gelê te, te ji bîr neke. Bila tu peyayekî zordarîlêkirî bî, ne setemkar bî. Min alîkariya wê di çapkirina çend pirtûkên malbata Bedirxaniyan kir mîna: Name ji Mustafa Kemal Paşa re, werger ji tirkî bo erebî, Bîranênên Min-Salih Bedirxan-werger ji tirkî bo erebî. Bîranênên jinekê (parçeya duyemîn) û hwd. Ev pirtûk tev bi alîkariya min hatine çapkirin û belavkirin. Rewşen Xanimê di doşeka mirinê de ev tişt ji min re digot: Kurê min dema em hebûn, hûn negihabûn; îro hûn gihane, lê mixabin em nemane. Kurê min, ji hev bez bikin û piştgiriya hev bikin. Yek bin kurê min, bela wela nebin. Min jê re çixarek Kent vexist û da destê wê lê heyfe netên hilmek kişand û da destê min û got: Bila ev çixareya dawî ji destê te be. Piştî ku ez hinekî li ser rewşa başûrê Kurdistanê û li ser hilbijartinan sekinimç. Rewşen

Xanimê gotina min birî û wiha got: Kurê min, yekitiya kurdan bide min, ez ê Kurdistanek azad bidim te. Piştî ku Rewşen Xanimê canê xwe spart Xwedê, li ser daxwaza wê û li gor sozên ku min dabûyê, min karûbarên veşartina wê kir û min cendekê wê ji bajarê Banyasê anî bajarê Şamê li teniştê mîrê wê Celadet û bapîrê wê Bedirxan Beg li goristana Şêx Xalidê Neqşrîbendî veşart.

Te gelek berhem ji zimanê erebî wergerandine kurdî, werger çî sîudê dide zimanê kurdî, giringiya wergerê ji bo zimanê kurdî çî ye?

Wergerandin bi serê xwe huner e, bi roleke pir girîng û pêwîst di damezrandina bîngeha seymanê neteweyî û şaristaniyê de radiibe. Wergerandin pireke pir pêdivî û girîng e di navbera wêjê û çanda gelan de. Di riya wergerandinê de, mirov pirtir sîudê werdigire û haydarî çanda gelên din dibe. Ji her neteweyê pirtir, pêdiviya kurdan bi karê wergerandinê heye. Kurd xwedî çandekê qedexekirî ne û bi dehê salan ji şaristaniyê dûr ketine. Ji ber vê yekê divê em berhemên ramên gelên din wergerînin ser zimanê xwe û pêşxistin û dewlemendkirina ziman, wêjê, çand û ramana ronakbîriyê geş bikin. Pêwîst e em sîudê ji zanyarî û pêşketinê gelên din werbigirin. Em çanda cîhanê nas bikin û çanda xwe ya nemir bi cîhanê bidin naskirin. Wergerandin şoreşek bi serê xwe ye. Bêguman vekirina asoyên nû li pêşiya ziman, raman û hunerê bi hemû şaxên xwe ve. Di baweriya min de, karê wergerandinê ne hêsan e û ne her kes dikare pê rabe. Divê wergêr qenc şaraziyê zimanê xwe be, her wiha şaraziyê zimanê ku jê wergerê dike. Divê mirovekî rewşenbîr û zana be û karê wî karekî afirîner e. Wergerandin vejandina deriyê jiyaneke nû vedike û riya rapêrîn û xwenasîne xweş dike. Min çend berhemên nivîskarên kurd wergerandine zimanê

erebî û weharenge min ji zimanê erebî jî çend berhem wergerandine zimanê kurdî. Armanca min ji wê wergerandinê ev e ku ez gelên din haydarî çand û wejeya kurdî bikim û bi gelên din bidim nasîn ku gelê kurd xwedî çand û wejeyekê pir dewlemend e.

Ji bilî wergera ji zimanê erebî te tîpguhêziya gelek berhemên kiriyê û ji tîpên erebî veguhastiyê tîpên latîni te çî hewcedarî bi wê yekê dît?


Di wê demê de, nivîsandina bi zimanê kurdî pir dijwar û bê nîrx bû. Her kes newêribû bi zimanê qedexekirî binivîsine. Rejîma Sûriyeyê bi dijwarî şerê ziman û çanda kurdî dikir. Riya nivîsandina bi zimanê erebî li pêşiya xortên kurda vekirî bû. Ew jî siyaseteke pir xerab bû, lê xortên me yê nûhatî di kovar û rojnameyên erebî de dinivîsandin. Dema wêneyên xwe di wan kovar û rojnameyan de didîtin pir dilşad dibûn û xwe pê qure dikirin. Di wê demê de, li Binxetê pîraniya helbestvanên nûhatî destê xwe avêtibûn nivîsandina helbesta erebî û di bin bandora çanda erebî de tevdi-geriyan. Valahiyek di navbera xortên nûhatî û helbesta kurdî ya klasîk de hebû. Dengê Cegerxwîn, Tîrêj û yên di bin bandora wan de bilind bû. Dengê helbesta kurdî ya nû di nav xortên nûhatî de laxer bû. Ji ber vê yekê dest bi şerê helbesta kurdî ya klasîk û zimanê kurdî hat kirin û bi kirx û bi ser-hilketin. Bi behaneya ku ne hezkerên helbesta kurdî ya kevneşop in û helbesta kurdî ya nûjen nîne. Bi behana ku zimanê kurdî lawaz e têra helbestvaniya wan nake. Bi rastî ez haydarî wê valahiyê bûm û di cih de û bi lez min dest bi tîpguhêziya çend dîwanên helbestvanên kurdên başûrê Kurdistanê kir mîna, Ebdulrehmanê Mizûrî, Hizrevan, Muhsin Qoçanî û Mueyid Teyib û hwd. Ev xebata min bû bîngeh û bêhnokek di navbera her du qonaxan de, qonaxa helbesta klasîk û ya nûjen de.



Dilawerê Zengî kî ye?

Dilawerê Zengî, piştî şewata sînemaya Amûdê bi heşt mehan tê ser rûyê dinê. Di sala 1961'ê de, li bajarê Amûdê hatiye dinê. Ji ber rewşa xizanî û feqîriyê xwendina xwe ya bilind kuta nekîr. Li ber destê Şêx Sedredînê Bavê Kal, Seydayê Tîrêj û Apo Osman Sebrî li ser ziman û wêjeya kurdî hûrbînî kiriyê. Gelek berhemên wî di warê helbest, çîrok, ziman, dîrok, wêjê, folklor û wergerê de hene, heta niha li derdora 30 pirtûkên wî hatine çapkirin.

Nirxandina romana Hechecîkê



Amed Tigrîs

“Derî Vekirî Bihêlin Wê Hechecîk Vegerin”

Ji deh salan bêtir e ku ez li ser hevwateriyên (sînonîmên) kurdî dixebitim. Hema hema min hemû ferhengên kurdî li bêjîngê xistin û hevwateriyên ku li wan rast hatim, min bi awayekî alfabetîk nivîsandin. Piştî roman û berhemên folklorîk ên ku bi dest dixim dixwînim û peyvên ku di ferhengan de tune bin ez kom û tomar dikim. Hevalên ku dizanin ez li pey berhevkirina hevwateriyên im, dema ew berhemekê bixwînin û peyvên sînonîm di wan de hebin, min agahdar dikin ku ez wê berhemê bixwînim û sêd û kelk jê bigirim. Du hefte berî niha cîranê min mamoste Ahmed Kanî ji min re got ku “romaneke Îrfan Amîda ya bi navê ‘Derî Vekirî Bihêlin Wê Hechecîk Vegerin’ derketiye û gelek peyvên ecêb û giran tê de hene. Heke tu bixwazî ez ê ji te re bînim bixwîne.” Min pirtûkê ji mamoste Ahmed Kanî girt. Ev romana ha di sala 2020’an de ji aliyê weşanxaneyê Lîsê ve hatiye weşandin. Edîtorê pirtûkê Tehsîn Baravî û sererastkirê wê Seleheddîn Aksoy e. Pirtûkê ji 11 beş û 216 rûpelan pêk tê.

Min berê çend berhemên mamoste Îrfan Amîna xwendibûn; berhemên wî baş bûn bi kurdiyêke zelal û rewan nivîsîbû. Min bi mebesta ku ez ê careke din bi kêfxweşî bixwînim, çêjeke edebî jê bigirim û hevwateriyên hêja bi dest bixim, dest bi xwendina romana Îrfan Amîda ya bi navê “Derî Vekirî Bihêlin Wê Hechecîk Vegerin” kir. Rûpela yekem ji serî heta dawî teswîr, rûpela duyem, rûpela sêyem, rûpela çarem, pêncem heman teswîr bûn. Lê teswîrên çawa? Gotin li pey hev hatine rêzkirin, çemandin, komkirin, qûçkirin. Wateriyên peyv û hevokan nayên fêmkirin. Gelek peyv di ciyê xwe de nehatine bikaranîn. Piraniya hevokan ne hevokên normal in, hevokên berejavî, bêwate û nivçe ne. Çavên min li wan peyv û hevokên ecêb asê bûn, ziman di devê min de gilor bû û min kir nekîr nikaribûm bi pêş ve herim. Hewez û hêza xwendinê bi min re nema û min dev ji xwendina wê berda. Dotira rojê ez poşman bûm û min dîsa dest bi xwendina wê kir. Min bi îşkenceyê beşa yekem qedand û xwest dest bi xwendina beşa duyem bikim. Min got qet nebe dê di beşa yekem de mijar, ziman, leheng, karakter, hawirdor, teswîr, çalakî werin guhertin. Min dît ku wekî formalîte pirtûk hatiye beşkirin. Beşa duyem ji her alî ve dewamiya beşa yekem e. Cih nehatiye guhertin. Bûyer li mal û hewşa pîrejînekê dom dîke. Cîranê pîrejînekê bi keça xwe ya biçûk re hatine cem pîrê. Li wir xwarin dixwin, sohbetê rojane dikin. Qaşê dê pîrê ji wan re çîroka malbata xwe vebêje, lê ew dikin nakin pîrê tiştêkî nabêje. Pîrê nexweş e û wê bi taksîyê dibin nexweşxanê û tînin. Balafir bi ser bajar re difirîn û dengê çend panzeran jî tê. Ji beşa yekê heta beşa yazdehan bûyer bi eynî kesan li eynî malê derbas dibe. Bi navê Mazlûm û Apê Osman du kesên din jî carcaran tînin mala wan xwarin dixwin, çay vedixwin sohbetê dikin. Di nav sohbetê wan de gotina “hevalan” derbas dibe. Di ciyê ku çiyar de behsa bajarê Nîsêbînê dikin: “Kes li bajêr nemaye û bar kirine...” dibêjin. Mirov di nav axaftina wan de gotina “xendekê” jî dibihîze. Lê li Nîsêbînê

kijan sal û dem, çi bûye, çi nebûye, bajar kivil kirine, ava kirine, çi ye, ne diyar e.

Teswîr, teswîr û teswîr ku mirov ji gotina teswîrê êdî dîkerixe. Heta dawî pîrê li ser şêmuğa deriyê xwe rûdine û çîroka xwe nabêje di ciyê de jî navê Dêrsim û jineke bi navê Zarîfe derbas dibin. Di dawiyê de bi navê Seyîdxanko kesekî tê kuştin. Çawa tê kuştin, li ku tê kuştin ne diyar û zelal e. Di rûpela 165’an de ji wan yek ji pîrê re dibêje, “doktor doh ji te re gotibû ji Nîsêbînê derkeve û divê tu derkevi.” Ev jî dide diyarkirin ku temenê mijara romanê du roj e û ciyê qada çalakiya wê jî li Nîsêbînê mala pîrê ye.

Ji bo hevok û hevokaziyên romanê çend nimûneyên balkêş wiha ne:

“Ne wekî Nesîma di ber fediyê xe. Ne gilî û gazin jî. Ji bo hinekî din belav bike bêhna mayî ya ji dengê birînê. Hevokê xwe rast li Nesîma girt lê; qirşikên di çavên wê de vemirîn hinekî din û vebirîqîn bibikên wê. Ew dît Zerga çêjeke miz î zelal li rûyê wê veda.” (Rûpel 41)

“Deng ji peyvan pê ve ne tu tişt bû vê carê. Ne pêş ne paş. Qut. Sar. Tîsî. Xav.

Daket rast li xwediyê deng nêrî. Ne vir de ne wê de. Qut. Sar. Xav.” (rûpel 103)

“Em bi du bizinan xwedî kirin dêya min. Wekî du karikan belkî jî. Porê di paxila xwe de ji me bêtir belkî jî. Cesedê Seyîdxanko ji me bêtir. Wekî nehêle bi-mire.

Xumexuma çavên wê belav bû wekî. Wekî xûsîkek ma tenê. Xurand.” (rûpel 216)

Tempûsa lêkar bêserûber e. Di hinekî hevokan de dema niha, di hinekî hevokan de dema borî bi kar niya.

Li gelek ciyan paragraf bi tîpa biçûk dest pê dîke. Li rûpelên 12, 13, 30,

31’ê binêrin. Ji rûpela destpêka romanê heta rûpela dawî çend peyv hatine dubare û dehbarekirin. Yek ji wan peyvên dubare û dehbare peyva “wekî” ye. Hema hema di her rûpelê de peyva “wekî” bi çend caran hatiye bikaranîn. Hevok bi gotina “wekî” dest pêdike û bi “wekî” diqede. Ka em bi hevdu re binêrin peyva “wekî” di rûpelekê de çend car hatine bikaranîn:

Di rûpela dehan de peyva “wekî” 10 car, di rûpela 19’an de 12 car, di rûpela 87’an 10 car, di rûpela 94’an de 9 car, di rûpela 174’an de 8 car, di rûpela 175’an de 8 car, di rûpela 180’î de 9 car, di rûpela 201’ê de 17 car, di rûpela 204’an de 16 car, di rûpela 205’an de 11 car, di rûpela 206’an de 15 car, di rûpela 210’î de 10 car hatine dubarekirin. Her wiha ev dubarekirina peyvan ji bo peyvên weke wilo, erjeng, fafik, hemîşîn, cefil, çêj... jî derbas dibin.

Diyalog kêma in. Diyalogên ku hene jî di bin siya teswîran de fetsîsîne.

Ji keçan re kur û ji kuran re keç gotiye: “Hêlîn keça min ma deng nayê te lawo?” (rûpel 61)

“Nesîma kurê min. (Rûpel 143) Gotina “Laleş” şaş e. Orîjînal gotinê ne “Laleş” e, “Laliş” e.

Gelek peyv û têgeh bi şaşî hatine bikaranîn. Di rûpela 26’an de “qîra asfalt” nivîsiye. Peyva qîr û asfalt hevwateriyên hev du ne. Du hevwateriyên wê yên din jî hene: qetran, qîr, zift, asfalt.

Di rûpela 27’an de gotina doşveger heye. Gotinên doş û veşer jî hevwateriyên hevdu ne. Çend hevwateriyên wan ên din jî hene: doş, çerx, zivir, qavz, veşer, çeng an çengberkî...


Tê gotin ku Îrfan Amîda û çendên din dixwazin ekola nivîskarê amerîkî Willîam Faulknerê ku di sala 1897’an bûye niha vejînin. Willîam Faulkner pêşî

helbestên teswîrî (portrait) nivîsîne û piştî bi heman metodê dest bi nivîsandina romannivîsandinê kiriye. W. Faulkner li Amerîka û Ewropayê weşanxane bi weşanxane geriyaye ku berhemên xwe bide çapê lê weşanxaneyên berhemên wî yên ku ji derî teswîrên dirêj, bêwate û monologên hundirîn hêjayê çapkirinê nedîtine. Willîam Faulkner di bîr û baweriyê xwe de ne mirovekî stabil bûye, tim dîtina xwe guhertiye, poşman bûye. Ew gelek caran di warê nivîsandina romanê de têk çûye. Piştî gelek salan çend senaryoyên wî li Hollywoodê hatine pejirandin û li ser wê navdar bûye. Piştî navdarbûna wî weşanxaneyên dest bi çapkirina berhemên wî kiriye û di sala 1949’an de Xelata Nobelê girtiye. Mirovekî pesîmîst û alkolk bûye. Dem çûye dewran veşeriyaye, roman niha di qad û asteke din de ye. Portraitiya Willîam Faulkner di nav rûpelên pêvajoya dîroka romanê de wenda bûye.

Romana Beriya Mêrdînê (Romana Heyamên Derbasbûyî)

Dîsa rojekê mamoste Receb Dildar telefonê min kir û got, “Bi navê Beriya Mêrdînê romaneke Konê Reş derketiye. Di wê romanê de gelek gotinên herêmî hene. Dikare ji xebata te ya hevwateriyên re bibe çavkaniyê baş.” Ez çûm min romana Beriya Mêrdînê (Romana Heyamên Derbasbûyî) kirî. Konê Reş behsa jidayikbûn, zaroktî û ciwantî, xwendekarî û gundê xwe dîke. Yanî ji serî heta dawî otobiyoğrafîya Konê Reş e. Ji aliyê komkirina hevwateriyên ve min sêd jê girt. Lê tiştêkî girîng heye ku otobiyoğrafî ne roman e. Dêrdê serê derdan weşanger Qahir Bateyî di dawiyê pirtûkê de dinivîse ku cîlda duyem a “Romana Beriya Mêrdînê (Romana Heyamên Derbasbûyî) jî li ber çapê ye.” Otobiyoğrafî çawa dibe roman?

Bruksel



Seyîdxan Anter

Salek ji salan, em li “Rojbaş Kurdistanana” a Seyîdxanê Torî bûne mevan. Di vê demê de “deh diçûn û deh dihatin” televîsyonê. Dilgermî û rûgeşî zora bêxewm-bûnê dibir! Bi dûv me de ne bi gelekî, redaktorê kovara Bîrnebûn Elî Çiftçî jî li me zêde bû.

Med tv programek li ser asîmîlasyonê amadê dikir. Tekstê ku hebûn bi tirkî bûn. Bejek ji wan jî Înstutîya kurdî ya Berlînê û beşek jî jî Înstutîya kurdî ya Stockholmê re şandibûn. Înstutîya Stockholmê beşek ku jê re hatibûn şandin, kiribû kurdî û para Înstutîya Berlînê wek xwe mabû. Înstutîya Berlînê kurdiya xwe “jî-bîra” kiribû. Lê gava gotin dibû ya wan, ew pêt bûn, xwe dişewitan-din û mirov jî bixwe re!

Programeke gelek hêja, tije kurterastî û bi naveroka xwe dolemend bû. Sosyolog, pisikolog, zimanzan û gelek pisporên din, bêyî dubarekirin û heman gotinan, ya xwe li ser planên asimilasyonê yê dewleta tirk digotin. Di wan salan de makamên Komara Tirk, herema Berfiratê û nemaze jî Rihayê ji vê plana xwe re hilbijartibû û jinên kurd ji xwe re kiribûne hedef.

Hogirek jin, dê ev program ji temaşevan û guhdaran re pêşkêş bikira. Dem li wê teng bibû. Em bi hev re çûn teksta ku hîna nehatibû wergerandin. Dilê amedekara me şad bû. Arjîna ku kurdiya wê tîr nekîr, di pêşkeşkirina programê de kurdiya wê bibû tiştêkî din.

Kurdekî me yê Anatolê, hemşeriyê E. Çiftçî jî li wir bû. Xatûna wî ji xebatkaran televîsyonê re xwarin çêdikir. Ciwamêr em ezimandin mala xwe. Hin ji me çûn û hin jî man.

Ew bi malbata xwe li dervî Bruksel li gundekî tîra xwe mezin dijîya. Kavilek xaniyan kiribû û lê dikir. Bi kasî ku li derve nemînin, bejek jê xelaskiribû û yên din jî hin bi hin avêdikir.

Hunerên mazûbanê me gelek bûn. Baxçê wî tîra xwe hebû, şîngeh, geş û mezin bû. Te digote qey axa mişarên xwe li seradê daye. Axa mişaran di serpêxetan re bû, ango banoxe bûn. Hoste fekî û şînahî çandibûn. Li baxçê wî, him dilê mirov li xwarin û vexwarinê vedibû û him jî bêhna mirov derdiket. Baxçeyekî tîzarok.

Berya ku mazûbanê me “li xwe vegere”, kurdiya zarokên wî ne tekûz bû; em wisa bêjin... Ciwamêr jî vê rewşê nerehet bûye û li careseriyekê digere. Di wê navê de, kurek ji wan re çêdibe. Ew bi xatûna xwe re biryarê distînin ku her kes bi lawik re, tenê bi kurdî bipeyivin. Di pratîkê de vî biryara xwe bicîh tînin. Bi xêra zarokê biçûk, zarokên wan yên mezin jî kurdî hîn bûne.

Gava wî ev buyer û careserî digot, çavên wî dikenîyan, kêfxweşî û serbilindîya wan baxçe tijî dikir. Aqubet li serê me hemûyan be!

Ma ne wisa?



'Vîna gelê Şengalê çima nas nakin?'

Navenda Nûçeyan

Piştî di 9'ê Cotmeha 2020'ê de di navbera Bexda-Hewlerê de Peymana Şengalê hatibû îmzekirin, xetereya li ser Şengalê her çû zêdetir bû. Di van rojên dawî de gefên ji aliyê dewleta Iraqê ve her zêde bûn. Dewleta Iraqê beriya niha ragihandibû ku divê heta 1'ê nîsanê Asayîşa Şengalê ji navendên xwe derkeve. Li hember vê nêzikatiya hikûmeta Iraqê gelê Şengalê jî bi mehan in li ser pêyan e û bertek û nerazîbûnên nîşan didin.

Têkildarî geşedanên dawî yê li Şengalê ji eşîra êzidiyan Şemo Xwedêda axivî û diyar kir ku ger beriya niha êzidiyan xwe bi rêxistin kiribûya dê 74 ferman bi serê wan de nehatana.

Qasim Şeşo

Şemo Xwedêda têkildarî peymanê 9'ê Cotmehê ya di navbera Bexda û Hewlerê de ev tişt anî ziman: "Mec-lisa eşîran li Şengalê heye û ji kesên ji Şengalê re wefedar in, parastina destkeftiyên wê dikin û ji bo berjewendiyên xwe yê kesayetî kar nakin, pêk tê. Kesê bi navê Qasim Şeşo bi rêya avakirina meclîsê hewl da şênîyên Şengalê bibe aliyê xwe. Lê jînên ku hatin qetilkirin kanî? Ciwanên ku

Şemo Xwedêda yê ji eşîra êzidiyan têkildarî gefên hikûmeta Iraqê ku li ser Şengalê zêde dibin, axivî. Xwedêda diyar kir ku ger di dîrokê de êzidî wek îro birêxistinkiribûna dê 74 ferman nehatana serê wan



serên wan hatin jêkirin û cenazeyên wan hîn li çolistanê ne kanî ne? Xwedêda der barê rêveberiya Şengalê de destnîşan kir ku êzidiyan heta niha rêxistina xwe ya siyasî ava kirine, xwe bi rêxistin kirine û wiha got: "Ger beriya niha êzidiyan xwe bi rêxistin kiribûya, 74 ferman bi serê wan de nedihat. Di hilbijartîyên bê de êzidî de dengên xwe bidin rêxistin û partiya xwe ya siyasî. Dê dengên xwe nedin kesên ku gelê xwe neparastin. Lê belê dê dengên xwe bidin kesên ku gelê êzidî di parlamen-toyê de diparêzin."

'Şervan ciwanên Şengalê ne'

Şemo Xwedêda piştrast kir ku Şengal ji aliyê gelê wê ve tê birêvebirin û ev tişt anî ziman: "Em êzidî xwe bi xwe bi rê ve dibin, şervanên li Şengalê ciwanên Şengalê ne. Mesûd Barazanî destnîşan kir ku ew ê di hilbijartînan de dengê partiya xwe bide Kazimî. Ji bo redkirina vîn û rêveberiya şengaliyan û Hêzên Berxwedana Şengalê dewleta tirk 5 milyar dolar dane wî. Lewre agahi-

yên nerast belav dikin. Kazimî şaştî-yeke mezin dike."

'Çima walî ne Şengalê ye?'

Xwedêda diyar kir ku gel çavkaniya rêveberiyê ye û wiha pê de çû: "Heke hikûmeta Iraqê bixwaze dikare di 5 deqeyan de waliyekî biguhere, di 20 deqeyan de dikare serokwezîrên Iraqê biguhere. Wê demê çima niha vîna gelê êzidî bi awayekî cidî nas nakin? Çima walîyê herêma Şengalê naguhere û li şûna wî yekî ji Şengalê erkdar nake? Sedema sereke ya vê yekê ew e ku dixwazin para Şengalê ji budçeyê bidizin û bixin berîka PDK ê."

Banga gelê êzidî

Şemo Xwedêda herî dawî bang li gelê êzidî kir ku hêzên xwe bikin yek û wiha got: "Gelê êzidî bi saya têkoşîna YBS'ê xwedî vîn û hêz e û dê mafên xwe bi dest bixe. Ev mafê me yê qanûnî ye û ne qedexe ye. Em bang li gelê xwe yê li derveyî Iraqê dikin û hewce ye destekê bidin civaka êzidî, dengê wan bigihînin civaka navneteweyî, her wiha em bang li rêxistinên mafên mirovan ên Iraqê û yê navneteweyî dikin ku piştigiriyê bidin gelê êzidî."



Qonaxa yekemîn a operasyona li kampa Holê bi dawî bû

Li kampên Hol û Rojê endamên malbatên DAIŞ'ê hatine bicihkirin. Hêzên navneteweyî piştgirî nedan darizandina girtiyên DAIŞ'ê û nexasim hemwelatîyên xwe yê ku tev li DAIŞ'ê bûbûn li hêviya rêveberiya kampê hiştibûn. Her çû sûc û kuştin li kampên zêde dibûn.

Hêzên DAIŞ'ê li gelek deveran ketibûn nav hewldanên xwebirêxistinkirinê û vê yekê fikarên hêzên navneteweyî zêde bûbûn. Lê belê tevî van fikarên hêzên navneteweyî li hemberî birêxistinbûna DAIŞ'ê tu gav nehatibûn avêtin.

Hêzên Ewlekariya Hundirîn a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê bi hev-

kariya YPJ, YPG û HSD'ê ji bo ku kampa Holê ji çeteyên DAIŞ'ê paqij bikin û birêxistina wan bişkinin di 28'ê adarê de Operasyona Mirovî û Ewlehiyê dabû destpêkirin. Piştî hefteyekê qonaxa yekemîn a operasyonê bi dawî bû.

Hêzên ewlekariya hundirîn der barê rewşa giştî û ya dawî ya operasyona li kampa Holê daxuyaniyek weşandin. Di daxuyaniyê de hat diyarkirin ku di qonaxa yekemîn a operasyonê de, ji serçete, emîr û dadgerên DAIŞ'ê bi giştî 125 çete hatine girtin. Di operasyonan de, heta niha gelek telefon, laptop, guleyên çekan, cilên leşkerî û amûr û pergalen

teqemeniyê hatine bidestxistin.

Yekîneyên Antî Terorê di şeva bidawîkirina qonaxa yekemîn de bi çalakiyê taybet di Operasyona Mirovî û Ewlehiyê de li kampa Holê 8 çeteyên şaneyên DAIŞ'ê girtin, di nav de serçeteyê DAIŞ'ê yê duymîn ê bi navê Ebû Gerar (Qosey Nayif) jî heye.

Çeteyên ku hatin girtin der barê rêxistinbûna xwe de û dabînkirina amûrên şer de axivîn. Emîr û serçete û dadgerên ku hatin girtin destnîşan kirin ku birêxistinbûna DAIŞ'ê bi awayekî bipergal dewam kiriye.

Her wiha hêzên ku tev li qonaxa yekemîn bûbûn piştî operasyonê hatin xelatkirin. **HESEKÊ**



Mem Avba

Li baxçeyê kurdî kulîlkekê biçîne bila geş be

Demek e di nav mala kurdî de hestiyarî, hêrs û bertekê weke şîne heye. Malîyên wê jî hev sar in, aciz in bi hêrs in. Gelo çima? Bêguman çavkaniya vê bê-yomî, fitne û fesadî, dek û dolabên dij-min û neyaran, dagirker û mêtîngeran, nemerud û xêrnexwazan in. Ji bo têgihîştina vê kahîntî ne lazim e. Hinek hestiyarî, çand, bîr û bawerî; dîlsozî û welatperweriya kurdîni bes e!

Bêguman ev weke rexneyekê ye li her aliyê siyasî, civakî, komelî, rewşênbir hwd ku li ser navê kurdî û kurdistanîyê xwedî gotin û kiryan in! Weke rojname-gerekî bêguman di serî de hem rexne, hem jî rexnedana li rojnameger, ragihandî-medya kurdî (bê cewazî) ye ku bi helwesteke hevgirtî û bi berpirsariya dî-rokî tevnerin. Mînak, niha weke ku çavkaniya pîrsgirêka dagirgehêna Kurdistanê kurd bixwe bin, ango li pêşiya azadî, bidestxistina maf û çarenûsa neteweyî kurd bixwe asteng bin, êrîşî hev dikin; ji devjeniya li dijî hev bigire heta reşkirin, zimandirêjiya li nîrxên neteweyî, yan jî li ser wan siyaseteke derveyî hest-tên neteweyî û kurdîniyê ku bêtir xizmeta politîkayên dagirkeran dike, tê kirin. Bêguman ez ne di asûna şîretkirin û aqildayîna van derdoran de me; her beşa welêt, gel, her rêxistin, sazî û dezgeh xwedî bîr û baweriyê kûr a dîrokî civakî ye; aqilê xwe jî, stratejiya xwe jî, armancên xwe jî hene. Mebesta min ev nîne. Dêrdê min, jan û êşa min, di vê werçerxa dîrokî de ku zilhlê plangeriya sed salên pêşerojê li pişt dergahan, li ser maseyan amade dikin; armancên neteweyî, çarenûsa gelê kurd e. Lê hêzên kurdî yê di asûna diyarkeran de, bi gotînekê ji hêrs û hesabên teng ên siyasî-hizbî-takekesî, mîna ku vê rastiyê dixin rêza duymîn, gorî dikin.

Mîna ku zilm û zordariya dagirkeran ne bes be, kurd jî bi hev re mijûl dibin. Gelo nayê dîtî ku gelê kurd di bin nîrê dagirkeriyê de dinale. Tu heyaman bi qasî vê serdemê bi rûmet û kerameta kurdan nehatibûn lîstin; nîrxên wan nehatibûn bînpêkirin. Wisa bûye ku li her çar aliyê welêt serdestên zilimkar bi awayekî bêserm û bêrûmet hebûna kurd jî nîqaş dikin.

Li Bakur, serê sedsala 20'emîn çî anîn serê ermen-asûr-rûm-çerkez hwd, çawa ew qir kirin û wisa kirin ku gotina ermen weke 'dijûn, şerm û bêzariyê' be, kurd anîne ber fetisandinê. Ji kuştin, zindankirin, hilweşandina gund û bajaran, xirabkirina gorên şehîdan, destdirêji hwd nîrxên ku dest neavêtinê nehiştin.

Li Başûr faşîzma erebên şîa ya piştî xwe dida Îranê, piştî Referandûma Serxwebûna Kurdistanê jî sê paran du parê Başûr dagir kir, dest dirêjî nîrx û destkeftiyên Başûr kir û niha jî bi boneyên cur bi cur dixwazin destkeftiyên mayî jî ji holê rakin; li aliyê dîtî dewleta tirk çawa êrîşî axa Başûr dike, bi kuştin, valakirin, şewitandina gund û jîngehan û hwd gel bêzar kiriye û dixwaze destkeftiyên Başûr bi giştî ji holê rabike, statuya bi berdêlên giranbuha çêbûye tune bike!

Li Rojava dîsa dewleta tirk bi destek û kişkirina efendiyan xwe yê zilhlê û hevkarên xwe yê herêmî çawa ji Efrînê bigire heta Serêkanî, Grê Spî û hwd dixwaze destkeftiyên kurdan ji holê rake û tune bike.

Li Şengalê di serî de dewleta tirk, zilhlêzan, şerma dîrokê çeteyên DAIŞ'ê çawa kiş kirin ser civaka êzidî ku weke eslê kurdîniyê tê dîtî û ligel qirkirina fi-

zîkî-olî, çawa bi rûmet û nîrxên gelê me lîstin, hê jî dixwazin vê bidomînin. Kobanê bi heman awayî...

Li Rojhilat jixwe sistema Îranê ku hebûna kurdan nas nake, weke metirsiya herî mezin a li hemberî xwe dibîne û bi rêbazên nerm û hişk her cure qirkirinê li ser gel pêk tîne; ji darvekirinan bigire heta bi birçîhiştin, li ser sînorên dagirkeriyê kuştinan, kurdan weke mirov jî nabîne!

Niha gefa tunekirinê li ser statuya Başûr, Rojava, Şengalê; fetisandina Bakur û Rojhilat didome. Nizanim gelo ev nayê dîtî? Baş e gelo ma ev ne sedemên ku nakokiyên bîrdozî, siyasî hwd çî dibin bila bibin, divê yekrêzî û yekîtiyê ku pêşî li van bigire pêk bê. Gelo çima her cara neyar êrîşî nîrxên kurdan dikin, kurd jî hev sîncdar dikin. Li şûna ku li dijî vê dagirkeriyê bibin yek, li şûna ku bêyî ferq û cudatî her kes van êrîşan li dijî xwe û hebûna xwe bibîne, li dij derkeve û civakê arasteyî wê bike; çima hev reşkirin û hev dehdana li hemêza dijmin, an jî bi hevkarîya dijminan sîncdarî û êrîşên şkandina rûmet û xîretê li dijî hev tê kirin? Bi min ne vegotîneke vê heye, ne jî bersivêke tu aliyan a maqûl!

Heçko kurdan zû dîroka xwe ya nêz jî bîr kiriye. Mînak, li Rojava, Başûr, Bakur, Şengalê hê çend sal berî niha kurdan bi gerîla, şervan û pêşmergeyan xwe ve destanên dîrokî nivîstin. Li Rojava li hemberî hovîtiya DAIŞ'a ku dewlet û zilhlêzan xwe li ber nedigirt, çawa gelê kurd bi yek hest, bîr û baweriyê, bi yek deng û alê bergirî kir, derseke dîrokî dan mirovahiyê ka kurd ji kîjan çand û dîrokê tînin! Mirovahiyê çawa bejna xwe li ber kurdan tewand û rêz nîşanî wan da. Ev giyana yekîtiyê bû, giyana kurdê berxwedêr bû...

Li Zapê, li Rojava, li Şengalê, li Kerkûkê, li Mexmûr-Hewlêrê, li Şêladizê-Amediyê, li Garê bi dehan mînakên vê hene û hemû jî bi serkeftinê tacîdar bûne. Kengî kurd lawaz bûne bizanibin ku ji ber parçebûn, belavbûn û xêrnexwaziya hev çêbûye. Her tim kurd bi yekîtiyê bi ser ketine, destkeftî bi dest xistine. Lewre ev demek e heçko ev giyana kurdewar ku ji dîroka kurdan a berxwedêr, şanaz û bi rûmet tê, lawaz bûye, hatiye jîbirkin. Lewre divê kurd xwe dawêşînin, an na li şûna qezencên mezin ên neteweyî, têkçûnên mezin ên giştî pêk bînin. Hema mînaka herî dawî ya nexweşeya Kurdistanê ku bi wêneyê Papa re hatbû çapkirin, divê kurd kumê xwe deynin ber xwe û bifikirin ka çawa neyar bi giştî bi dengêkî û helwestekê weke ku şûr di dilê wan de daçikandibe, kirin qareqar, li ser dijberiya kurdan bûn yek! Li Garê çawa xwestin konseptê tunekirinê bibin serî û meha sibatê ji bo kurdan bikin meha reş û bêyom! Lê dîsa li kelemê berxwedanê terpilîn. Bi wê serkeftinê kurd hemû şanaz bûn û bi coşa cejnê pîroz kirin. Bêguman ev diyariya herî hêja ya Newrozê bû ji bo tevahiya gelê kurd.

Gelê kurd ne layiqî wê ye ku rûmeta wî di bin lingên serdestan de ewqas bê perçiqadin û biçûkxistin. Kurdistan û gelê kurd ji partîyan, berjewendî û nakokiyên wan pêşdetir e. Hebûn û nîrxên kurdan û Kurdistanê nikare ji bo wan bîrê gorikirin. Nirx, destkeftî û saziyên kurdan pîrozîyên hemû kurdan in û divê kurd hemû bi heman hest û helwestê xwedî lê derkevin; ne ku reş bikin, biçûk bixin û avê bikêşin aşê neyaran!

Doza girtina HDP'ê û biryara AYM'ê

Navenda Nûçeyan

Piştî bi daxwaza girtina Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) serî li Dadgeha Makeqanûnê hat dayîn, Desteya Giştî ya Makeqanûnê di lêkolîna pêşîn de biryara îfadeyê da

Di van salên dawî de di çarçoveya operasyonên qirkirina siyasî de êrişên li ser Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) yê ji aliyê dewleta tirk ve her çûn zêdetir bûn. Li Tirkîyeyê girtina partiyên kurdan wek kevneşopîyeke dewleta tirk didome. Heta niha ji aliyê hikûmetên tirk ve bi gelek caran partî hatine girtin û ev kevneşopî hê jî xwe dubare dike.

Herî dawî di 18'ê adarê de Dadgeha Bilind a Tirkîyeyê bi daxwaza girtina HDP'ê serî li Dadgeha Makeqanûnê da. Îdianameya ku ji aliyê serdozgerê Dadgeha Bilind Bekîr Şahîn ve hat amadekirin, der barê 687 siyasethedarên HDP'ê de qedexeya siyasêtiyê ji bo 5 salan tê xwestin.

Biryara îfadekirinê

Piştî doza li ser girtina HDP'ê, Desteya Giştî ya Makeqanûnê di lêkolîna pêşîn de biryara îfadeyê da û Dadgeha Makeqanûnê di civîna rojevê de lêkolîna xwe ya pêşîn kir. Desteya giştî kêmasiyên usûlî yê îdianameyê tespît kir û ji bo temamkirina kêmasiyan serlêdan îfadeyî Serdozgeriya Komarê ya Saziya Darizandinê kir. Heke kêmasî werin temamkirin û were pêşkêşkirin dibe ku dîsa lêkolîn were kirin. Desteya giştî dê piştê dîsa bive û biryar bide ka îdianame hatiye qebûl kirin an na.

Wateya biryara AYM'ê

Têkildarî biryara Dadgeha Makeqanûnê berdevka HDP'ê Ebrû Gunay axivî û diyar kir biryara AYM'ê ji qaydeyê wêdetir red a 'esasî' ye nixandin



û bi biryarê îdianame hatiye pûçkirin.

Ebrû Gunay da zanîn ku AYM'ê îdianame ji aliyê qaydeyî ve lêkolîn kiriyê û paş de vegehandiyê û wiha got: "AYM'ê ev eletewşiyên der barê partiya me de tenê ji aliyê şiklî ve nedît, di heman demê de got bêdelîl, bêbingeh û xwe naspêre heqîqetê. Ji niha ve teza serdozgeriyê pûç bûye. Tu eleqeya vê îdianameyê bi rastiyê re nîne. Metnek pir bêcîdî ye. Ev metin li midûriyeten polîsan jî wisa nayên amadekirin."

'Tolhildana ji HDP'ê deşifre bû'

Gunay di berdevkama axaftina xwe

de destnîşan kir ku bi vekirina doza girtina HDP'ê xwestin sekna muxalif a HDP'ê ji holê rakin û ev tişt anî ziman: "Bi vê biryara AYM'ê re tolhildana siyasî ya ji HDP'ê hat deşifrekirin. Tevî hemû zext û zordestiyan jî HDP meşa pê bawer e didomîne û ji ber bi têkoşîna HDP'ê nikarin dixwazin bi zilmê û îdianameyên wiha bêbingeh HDP'ê bigirin. Lê wê têkoşîna me bidome."

'Îdianameyê wîha tune ye'

Der barê biryara AYM'ê de Serokê Koma HDP'ê Sarûhan Olûç bang li AYM'ê kir û wiha got: "Divê AYM nebe parçeyek amûra lîstika desthilatê.

Desthilat dixwaze bi rêya AYM'ê ji ber sedemên siyasî tola xwe ji me hilde."

Sarûhan Olûç di axaftina xwe de bal kişand ser vekirina doza girtina HDP'ê û ev tişt anî ziman: "Îdianameyek ewqas bêhiqûq û pûç e, naveroka wê hemû bi sedemên siyasî hatiye amadekirin. Tiştêk wisa nehatiye dîtin. Gelek tiştên di hundirê wê de hêj di li ber lêpîrsînê ne lê dîsa jî kirine nav îdianameyê. Binêrin tiştêk balkêştir heye, îdianameya Kobanê ku hêj nehatiye destpêkirin jî kirine hundirê îdianameya doza girtinê. Mirov dibêje qey biryar hatiye dayîn, rabûne îdianameya Kobanê jî tê de bi cih kirine."



'Cihê komeleya tirkan li Fransayê nîn e'

Berdevkê hikûmeta Fransayê Gabriel Attal diyar kir ku komeleya 'Millî Goruş' a tirkî nixê komara Fransayê binpê dike û ajandeyên derve û planên hikûmeta tirk pêk tîne, ji ber wê cihê wê li Fransayê nîn e.

Attal ji medyaya Fransayê re ragihand ku ev komele li dijî nixê komara Fransayê, li dijî wekheviya di navbera zayendan de û li dijî rûmeta mirovahiyê disekine û got ku dê baş be ku ev komele li Fransayê kar neke, lê belê diyar kir ku daxuyaniyên wî nayên wateya qedexekirina

wê komeleyê.

Van daxuyaniyan di hefteyên dawîn de li Fransayê bû rojeveke nîqaşê ya berfireh.

Komeleya "Millî Goruş" tevî du rêxistinên din di çileya borî de îmzekirina peymanê li dijî tundrawiyê red kiribû.

Millî Goruş komeleyeke Tirkîyeyê ye û navenda wê li bajarê Koln e Almaniyayê ye. Damezirînerê wê, serokwezîrê berê yê Tirkîyeyê Necmettin Erbakan e ku wekî "mamosteyê" Recep Tayyip Erdogan tê nasîn. **PARİS**

NY dê rêzecivînan li dar bixe

Nûnerê Vîyetnamê yê Neteyên Yekbûyî (NY) Dang Dinh Quy aşkera kir ku Konseya Ewlehiyê di 8'ê nîsanê de dê gelek civînan li dar bixe. Nîqaşên destpêkê dê di 8'ê nîsanê de der barê paqijkirina mayinan de were lidarxistin. Her wiha di 22'yê nîsanê de, dê bi beşdariya nûnerên Îsraîl û Filistinê nîqaşek der barê çareserkirina aloziya Filistin-Îsraîlê de, pêk were. Dîplomat got ku Konseya Ewlehiyê dê di 6'ê nîsanê de çekên kîmyewî yê Sûriyeyê û rêkeftina siyasî ya li Sûriyeyê û her

wiha aloziyên li Yemenê jî gotûbêj bike. Der barê rewşa Myanmarê de jî Dang Dinh Quy diyar kir ku Konseya Ewlehiyê rewşa Myanmarê bi baldarî dişopîne, her wiha dê di 9'ê Nîsanê de civînek der barê vî mijarê de jî were lidarxistin. **BRUKSEL**



Li Deryaya Spî destwerdana Rûsyayê

Rojnameyên erebî hefteya borî bal kişandin ser destwerdana Rûsyayê li şerê li ser gaza deryaya Spî û piştgiyariya Amerîkayê ji hevkarên xwe yê li Rojhilata Navîn.

Rojnameyên erebî di nûçeyên xwe de behsa destwerdana Rûsyayê li aloziya rojhilatê deryaya Spî kirin û wiha nivîsandin: "Rûsyayê ket pêşbarka li ser gaza li rojhilatê deryaya Spî û ji bo wê yekê peymanên berê yê bi rejîma Sûriyeyê re bi kar anîn. Li gorî wan peymanan hevkarên rejîmê wekî berdeîla destwerdana leşkerî a yekser, dikarin li ava herêmi xebatên lêgerîna li

gaz û petrolê bimeşînin. Ketina Rûsyayê ya ji nişka ve li ser xeta gaz û petrola li rojhilatê deryaya Spî, hikûmeta tirk kir bin zextê. Her wiha Lubnanê li hemberî wê yekê bertekên bihêrs nîşan dan, ji ber ku peyman di navbera Şam û Moskovê de destûrê dide xebatên lêgerîna li herêmeke ji bo du welatan bi nakok e. Dezgehên çapemeniyê yê girêdayî hikûmeta Şamê ragihand ku Şamê peymanê nû îmze kiriyê û li gorî wê 2 şirketên Rûsyayê dikarin li hemberî peravên Sûriyeyê li deryaya Spî xebatên lêgerîna li gaz û petrolê pêk bînin." **ŞAM**



Ramazan Olçen

Şirkatiya gunehan

Parzemîna Ewropayê xwe weke navnişana demokrasî û azadiyan bi nav dike. Helbet aliyek wê yê rast jî heye. Di encama têkoşîna bi sedê salan a civakên ewropî de, di milê jiyana 'social' de hin destkeftî hene. Civak bi rêya sazî û dezgehên xwe heta radeyekê wê 'social'iyetê didomîne. Lê di milê dewletan de demokrasî û azadî bi tenê weke reklam tên bikaranîn.

Ew dewletên giregir gav bi gav xwe ji qada 'social' vedikişînin. Wê qadê weke ku qadeke criminal be terkî însafa şirketan dikin û van şirketan jî bi eskeriyê diparêzin. Ewropa bi vî halê xwe navnişana paradokseke mezin e. Civak bi keda xwe ya socialbûnê bi pêş dixê. Piştê dewlet radiibe xwe weke xwedî û parzvana socialiyê datîne holê piştê jî qada navborî vedike û eskeriya bi baca civakê tê xwedîkirin berî canê civakê dide.


Niha hûn ê bibêjin, li te xêr e! Ji me re çî ji hal û ehwalê Ewropayê. Naxêr! Îro li vî gundê mezin ê em jê re dibêjin dinya, bûyereke yan jî rewşeke li taxa jorîn bandora xwe li ser taxên din jî heye. Rewşa berovajiyê wê jî bi heman şeweyî ye.

Niha dêhna xwe bidinê li taxeke jêrîn çeteyek rabûye, bêhna civakê çikandiye. Bi ser de her çî kesên xwedî aqil û azmûn, xwedî feh û feraset heye xistine zindanê. Rabûye rêberê gelekî di zindanê de di pergaleke bêrehim de radigire û bi ser de jî ev çete dema tengav dibe behsa qanûn û yasayan dike. Heta heman çete dema kew jê re li darê bikeve gefan li taxa jorîn jî dixwe. Lê heke tengav bibe îcar dîsa behsa tevlihbûna koma taxa jorîn dike. Helbet curet û cesaretê jî helwesta taxa jorîn digire û wisa dike.

Îcar li ser vê meseleyê fantastîk têkiliyêkê kême zêde wisa di navbera Ewropa û Tirkîyeyê de heye. Ew giregirên ewropî jî bo berjewendiyên xwe, ji bo nûkirina peymanan penaberan lempeya kesk ji Tirkîyeyê re pêdixin. Ev lempeya kesk jî ji bo milletan bi taybetî jî ji bo millet kurd û ji bo hêzên demokrasîyê tê wateya êş û azarên mezin.

Di vir de her çî qas ji mafê mirov be ku helwesta Ewropayê rexne bikin jî di asta mezintir de divê mirov berê tîrên rexneyan bide xwe. Madem dinya gundekî mezin e global e û qedera mirovan bi hev ve girêdayî ye. Wê demê lazim e li dijî rayedaran şênîyên taxan hêza xwe bikin yek. Bêexlaqî û bêwijdaniyê qebûl nekin. Encax bi vî awayî em bikaribin dawî li şirkatiya gunehan a van hêzan jî bînin û azad û aram bijîn.





Ji Delav

Feratê Dengizî

Hê jî nizanîm ez kî me û ez çî me? Di demên pêş de belkî navekî min çêbibe yan jî hinek navekî li min bikin û min pênasê bikin. Nizanîm.

Wê şeve bi tirs ji xew şiyar bû. Her çiqasî ava cemedî li ser çavên xwe kir û porê xwe şil kir jî gêjîya wî neçû. Di nav tasewas û xeyalan de bû. Piştî taştê rahîşt dasa xwe û berê xwe da nava rez. Reze wî li nik Baxçeyên Selehiyê yê binya latên mezin bû. Ji vira Tîjle xweş dixwiya û nerîna li Heskîfê mirov dilxweş, kêfxweş û dilaram dikir. Her çiqasî ji vira aliye kelehê, sere kelehê nedixuya jî hêza xebatê dida mirov.

Piştî xebateke demdirêj, pala xwe da kendalekî û xwe bera nav xweşîya xwezayê da. Çawa be kesaxa wî ne zêde bû. Xwedêyo, ev çî xweşî bû. Rezan mil dabûn hevdu, benên wan bi gul û çîçekan nexiştandî... Selehiyê tev dixuya, darên sêv, mişmiş, hinar û hejîran ango baxçeyan jî xwe spartibûn rezan. Li binya rê keç û jinan kare malê qedandibûn, zarokên bêvil lîçik li pey wan, bere xwe dabûn qiraxa Tîjleyê.

“Herê Tîjleya nerm, pir xweşîk. Xweşîkahî û xweşherîkîna ava te mirov sermest dike” got di dile xwe de. “Ev çî xweşherîkîn e? Hêza çiyê di dile te de...” Bala wî çû ser şikefta wî alî avê, ya di lata wî alî çem de. Hele, hela... Dîsa gêj bû.

Bera ev colê me çî qasî bi heybet û bê serî û ber e. Kes li kesî guhdar nake. Ruhê min bi wan re çû. Gotin bi serê wan de nare, bêfêhm in, ji başî û hewcedariyan bêhay in. Bîra rêz û meş û ciwandinê û xetereyan nabin. Ketberê dijîn û her tim di derekê re werdidûn an jî tiştinê hov wan dixwin. Êdî ez ji jiyana colîn acizim, bi colê re naqedînim. Ne porqijîkê bûna karê min zor bû. Nizam çî bikim.

Tev gêj in. Di nav pirça xwe de winda

bûne, mîna wan hûtên çiyê. Deng bi sere wan de naçe, ne fêhmdar in. Lave-lavek û qebeqebek di nav devê wan de ye, mirov ji wan fêhm nake. Min got, “mîrov!” ê wele ez jî nizanîm mirov çî ye? Lê va tê ser zarê min, neyê ser. Pêşî bi îşaret, dehfdan û rêdanê min hebekî rêzan û pîvan da wan. Me ev şikeft kolan bi hev re. Hoste ez bûm. Paşê me şikeftên xwe bi rêyek bin erdê re, bi reşahiye ve girêdan û nepenî hişt, wek kewiyê bû, ji bona ewlehiyê. Jixwe şikeftên me tev bi hev ve girêdayî bûn, ji yekê em derbasî ya dinê dibûn. Em bi hejmarê nizanînin, lê pir bûn, bi qasî balindeyên li hewayê. Rêya asasî di nav avê de bû, ya bi dizî jî me çend kesan dizanî. Carinan şeveqê di vira re derdiketim û diçûm nêçîrê. Ev rindika porqijîk î çavhungivîn jî heja ye, xwîngerm û xweşîk e. Lê ez bi qasî wê ne bîaqilim. Xurt im, lê têgihîştina min qels e. Ev meseleya li qiraxa avê kolana şikeftan wê bi ber me xistibû.

Rojên betlanê zû diqedin. Kare darîreya fermî jî ne giran bû. Bi hêsanî ji heq derdiket, lê derdê nezanî û cahiliya gundiyan ew bêzar dikir, dile wî bi wan dişewitî. Dizanibû ku pergala serdest wek qeydek hesine, ew jî tê de, mirov, ruhê mirov dişidîne û xwînê di canê mirov de nahêle...

Îro karê rez tune bû, berê xwe da sere kelehê. Beriya ku bajar dakeve dora rê, dora pira nû û çem mala wan jî li vira bû. Di “Deriyê Medan” re bi awirên dilkeser li porê rojê yê nexişkirî yê tozgirî yî nivbirqane nihêrî. Sêra dûpişkê ne li çiyê xwe bû. Hatibû dizîn. Lewra li serê kelehê dûpişka bi mirov vedida. Ma çî-qasî pir bûn. Te digot çî axa vira tev dûpişk in. Hêdî, hêdî meşiya. Di kaşê rê de desten xwe da pişt xwe. Sere xwe hejand, serî di ber de. Deriyê duyemîn ê “Fersan” ku sêra mar wisa reşbiriqîn li ser dixwiya, hê tekûz bû, bi rastî jî li serê

kelê mar bi mirov venedida. Dihate gotin ku ji ber vê sêrê ye. Deriyê dawîn ne şeş be yê “Qereqoyîniyan” bû, bê sêr. Hebikî hilweşiyayî. Xwe gihand rasta serê kelê, ber camiyê. Divê li dûvpişkan miqate bûna. Hersê derî jî li ser rêyekê bûn, rêya asasî. Li rasta ber camiyê bi dilgûvaştî meşiya. Rasta hespbeziya qaşo Hesen! Hesenê ber sêdarê. Bi xwesteka dawîn bi kêf li vê rastê hesp bezandibû û xwe di ser Tîjleyê re qevastibû... Herê axê, herê waro! “Hesenkêf, Hesenkêyf, navê lê hati!” “Heskîfa me herimand” digot di dilê xwe de. Difikirî ku îro zêde kes jî li derdorê nîne. Xalî bû Heskîfa melûl, kesî xatir jî nedixwest...

Bi rastî Heskîf li ser tehtek mezin û fireh bû. Mal, xanî û şikeftên ku tê de hatibûn kolan bi şêwe wek kefa heskê bûn, heskîn. Şikeftên wê “hesk”în bûn, Heskîfa dîrokî ya dilêş! Ji vê rastê, ji vira, ji serê kelê her der dixwiya. Rêyek bi tene dihat vira. Ya li rojava hebekî biçûk û bi ristînek, hûnandinek kevirîn î zexm hatibû asêkirin, kaşê wê pîr tik bû. “Niha ez qala Heskîfa, Eskîfa ji qal û belayê bikim tê dernayem” got ji xwe re û gera xwe domand. Seriyek da herdu cercikên ku bi nepenî ji bona avê, avanîndê dadiketin Tîjleyê û rewşaramekê dile wî dagirt. Zilamekî ciwan, jîr û karker bû, ji karê xwe, ji kedê hez dikir. Lê xûyekî wî yê ecêb hebû. Ji xwe diçû. Carinan nizanibû çî ye, kî ye, li ku ye... Di nav van ramanan de ew mamosteya ciwan î porqijîk î çavhungivîn ket bîrê. Gelo rojek şemiyê piştî nivro ku dersdayîn diqediya nikaribû pê re here gerê, seyranê. Derdora tehta qîza qerê û serêkaniya, serêava pişt latên Selehiyê pir xweş bû. Têkiliya wan xweş bû, ku diya wê jî destûr bidana...

Bi awirên kûr î nepen li Tîjleyê dinêrî; Çiyayê Rima, Pira Kevn, Îmam Evdela, Pira Nû, Ser Pira, Bin Pira û ew şikeftên ku ji wan re digotin “Malên

Medan”* bala wî kişand. Şikeftik bi serê xwe di nivê lata di ser Tîjle de hebû, ji şikeftan tevan dûr, ku bala wî çû ser, dîsa gêjîya wî hat. Bêhna wî çikiya û te digot qey di binê avê de ye. Avê hêdî hêdî gewriya wî dixitmand, bênefes dima. Xîrexir diket qirika wî. Dîsa ber çavên wî tarî û hişê wî şolî. Hela, hela...

--- *: ji malên serê kelê re jî wisa digotin.

Min şikefta xwe ediland. Tîfîkek ku dû nagire çêkir. Çiyê xwarinên ku ji bonî zivistanê hilînim, xweş kir. Çiyê rûniştinê, yê paqijiyê û hwd... Çiyê herî xweş ê şikeftê ber devê wê bû. Min du sedrên ku li ser rûnê û li avê temaşe bikim çêkir. Av, boş û coşîya herikîna wê pir bala min dikîşand. Di seyra wê de gelek raman di serê min de diçûn û dihatin, gelek tiştan êrîşî mêjiyê min dikir. Ji ber vê min pir jî vê avê û herikîna wê hez dikir û kelecân dida min. Av, ev çî bû! Bingeha jiyane. Ev çî ye, ji çî çêdibe û bi ku ve diçe! Çima candar bêyî wê naqedînin û bêyî wê najîn... Of... Her çî be! Rêya nepenî ya ku ji avê tê ya ku di bin wê hejîra di latê de ye û ya banî min tekûz kir. Ma ku ez porqurîşkê qanih bikim û bînim vira.

Gotina min ducar nekir. Yanî wate da îşaret û tevgerên min. Bi dilxweşî da pey min. Dile min bi kelecânî lê dida, mîna yê kevokê, wek ku hestên cuda li min peyda bûn ku ji qalibê xwe derbik- evim. Bi kêfxweşî li şikefta min geriya û hat li ser sedra li pêşberî min rûnişt. Ligel kenekî tinazî bi awirên xwe ez darizandim: “Çawa tu col êdîterikîni? Çawa tu wan bitenê dihêlî? Ma jiyana bi serê xwe dibe, wê halê jin, extiyar û zarokan çî be? Tu bikêrhatiyê wan î û bi tenê xwe û dixwazî min jî bikî hevparê sûcê xwe...”

Mûyên canê min bûn wek diriyan ku di canê min de biçikin. Ber bi min ve hat. Hêviyek ket dilê min ku min bipêçe û ramûse, wisa dilşa me. Lê ji nedîtî ve des-

tên xwe xist qirika min. Gêja min çû.

Dema ku min çavên xwe vekirin, ez û ew di nav golek ava boş, bi coş î pir zede de bûn. Xîrexir ket qirika min. Çavên wê jî beloq bûn. Em difetisîn.

Xewn bû, xeyal bû nizanîm. Wek milyaketên çiyê keç û xortên mil bi çek ku qet min rewşa wan xeyal nedikir, bi rêzê ber bi me ve dihatin. Bi nav nedibûn. Li ser avê dimeşîyan. Roj li ber ava. Di sorînga roja rojava de wek ku av sekini û her der aram bû. Gulîstaneke, baxçeyekî îremî hat hişê min, wisa di dil û mêjiyê min de bi cî bû, şewq dida. Rûyê çavhungivê geş bû. Gêjîya min didome. Gelo ez kî me! Ev çî ye! Nizanîm.

Zilam û keçeke porqijîk dest di dest de, di neqebên Salihiyê de ku Selehdîn Eyûbî li vira ciwanîya xwe borandibû, ber bi Textê Qîza Qerêl ve diçûn. Demsal bihara xalîçeya Ecemî. Kulîkên cur be cur xweza, dayê xweza dikemiland û Heskîfê îro keybanûya jiyane.

Wexta ku herdu li tenîştî hev rûniştin û lingên xwe bi tehtê ve berdan, bala zilâm dîsa çû ser wê şikefta bitenê. Xeniqînê ew girt, dîsa. Jinik behitî ma. Av, her diçû bilind dibû, ew jî wek ku girêdayî bûn. Nikaribûn bileqin. Xîrexir qet qirika zilâm. Av, bi ser pira kevî ket. Minareya qut û ya tenîştî pîre jî êdî binav bûn. Nefes diçû, çav beloq bûn. Xewn bû, xeyal bû, çî bû. Nedizanîm.

Heskîf têk diçû; jiyana, dîrok, şarîtanî têk diçû. Rêzek milyaketên çiyê, çek li dest, keç û xort di rêzê de li ser avê dimeşîyan, wek ku li ser xalîçeya Sînbade Şehrazat bin. Av giran bû, her ku diçû nizm dibû, wek firtone yan jî ejderhayê ku kedî bibe serî bitewîne, bi çavên melûlî li şervanan, ango milyaketên çiyê dinêrî...

Nizam çî dewran bû. Ez û Tu... Ew ê bêkes, tîkûtenê û sêwî.

Di dîroka îslamê de bêpergalî

Emîn Dilsoz

Nivîsa min a berê, li ser dîroknivîsiya têgihîştina çavkaniyên olî yê sereke qur’an û hedîsên pêxember bû. Me gotibû gelo bi guherîna demê re têgihîştina mirov diguhere yan wek yê dibêjin qur’an gerdûnî ye û têgihîştina wê ya berê çî be wê heta dawiyê ew be?

Li ser vê yekê Fedlûrehman wiha dibêje: “Di îslamê de metin tune ye ancax şîrove heye” ango têgehîştineke cemedî tune ye, li gor demê têgihîştin heye. Ev yek jî nêzikî nivîsa min a berê ye ku me gotibû têgehîştin li gor demê diguhere. Gava mirov bala xwe dide dîroka îslamê, pirsgerîka herî mezin ku nehiştin ola îslamê li gorî dem û çaxê xwe nû bike. Ev bê (metodolojî) pergala nav alema îslamê bû sedem ku ola îslamê ji 800’î heta 1.300’î hin rewşenbîrên wek Farabî, Îbnî Sîna, Îbnî Rûşd û gelek rewşenbîrên din derkevin holê. Piştî vê serdema ku 500 sal domiya, pêşveçûna rewşenbîrî di alema îslamê derneketiye bi pêş neketiye. Zanist bi pêş ve neçû û mirov dikare bibêje bi paş ve diçe. Digel gelek kêmasiyên wê di serdema pêncsed salî de çêbûn, bê hesab tiştên ne di rê de pêk hatin.

Yên hinekî pêşî li aqil vekirin, rewşenbîrên wek 1. Câbir Bin Hayyân (720-815) kurê dermanvanekî li Kûfê hatiye dinê. 2. Harezmi (780-850) li Ozbekistanê bajarê Xarizmê hatiye dinê. 3. Farabî (873-950) li

Tirkistanê bajarê Farabê hatiye dinê. 4. Bîrûnî (973-1061) li Îranê li herêma Şah Ebbasê Welî li gundê qasê hatiye dinê. 5. Îbn-î Sîna (980 – 1037) li Bûxarayê gundê Afşanayê hatiye dinê. 6. Ebul-iz Cezerî (1136-1206) li bakurê Kurdistanê Cizira Botan li taxa Torê hatiye dinê. 7. Ulug Bey Mîrza Mihemed kurê Şahrûh li Ozbekistanê bajarê Sulatniyyeyê hatiye dinê. (1394-1449)

Gava mirov bala xwe bide dîroka wan hemû ronakbîran ji bilî yek an duduyan di nav pêncsed salî de derketine pêş. Mirov baş bala xwe bidê, jidayikbûn û cihê lê hatine dinê, ne navenda erdnîgariya îslamê ye. Evên me jimartin, hemû ji aliyê Rojhilata Nêzikê Çînê hatine. Dibe ku hukma hedîsa pêxember ku gotiye “li pey zanistê

herin ger li Çînê be jî”. Gava pêxember ev yek gotiye belkî xwestiye berê umeta xwe bide zanyariya ku ji aliyê Çînê ve were. Lê mixabin peyrewên wî bi ya wî nekirin tiştên wî xwest pêk neanîn û li ber yê xwestin pêk bînin bûn asteng.

Li aliyê rojava jî gelek zanyar û rewşenbîrên wek: Îbnî Bace Fas (1139 wefat), Îbnî Rûşd Kurtuba Endulus (1126-1198), Îbnî Xeldûn Tûnis (1323-1406) Şêx Mihyeddîne Erebi (1165) li rojhilatê Endulusê bajarê sereke yê herêma Tudmîr (Teodomiro) yê Mursiye (Murcia) yê de hatiye dinê. Ebûbekir Muhammed b. Ebdûlmelik b. Muhammed b. Muhammed b. Tufeyl Elqeyî wefat (1185). Yanî dixwazim vê yekê diyar bikim ku zanista nav ola îslamê bi tevîbûna felsefeya ewropî ev lehengên hanê derke-

tin û holê ronahiya wan da hemû cîhanê. Sedema ku berdewama wê nehat ev yek e: li gor min nîqaşa dîrokanî û gerdûnîtiya alema îslamê ye, ango serê di navbera olperest û zanistê de ye. Lê bêguman olperest bi olê simsariyê dikin û tenê ji bo berjewendiyên xwe bi kar anîne û tînin. Wek Xezalî di vê serdema ku zanist di nav alema îslamê de dibiriqî olperest Xezalî hat; Tehafetu-İfelasîfe (bêvaciya) fîlozofan li hember zanist û felsefeyê derket û serdema îslamê ya zêrîn têk bir û hemû ser û bin kir. Heta Îbnî Tufeyl bi pirtûka xwe ya bi navê (bêvaciya bêvacan) bersiva Xezalî da lê mixabin pergala ku Xezalî xwest di şûna zanistê de biçihkirina mutesewwifan çihê xwe girt, bersiva Îbnî Tufeyl li Ewropayê belav bû. Heta mirov dikare bibêje bandora xwe li Ronesansa Ewropayê jî kir. Mixabin di alema îslamê de nebû bersiv û cihê xwe negirt. Heta tê şîrovekirin ku dema Yavûz Sultan Selîm sînorê Osmanî li Rojhilata Navîn fireh kir, ket nav îslama olperest û mutesewwifan. Ev yek bû sedem ku Osmanî li paş man hetanî bû sedema têkçûna Osmanîyan. Ji bo vê yekê Ataturk di xala pêşî ya ‘şoresa’ xwe de, teke û derwêşxaneyên mutesewwifan qedexa kirin. Ji dema ‘şoresa’ Xezalî de mirov dikare bibêje di cihê zanist û zanîndê de, olperestî û paşvrûtiya sofîyan derket pêş û alema îslamê di nav cehaleta xwe de ev nêzî hezar sal in digevize, piçek bi pêş nakeve.

Vê yekê bandorek gelek xerab li têgi-

hîştina olê kir. Kesî nekarî tiştêk nû biafirîne. Kî hat şîroveya beriya xwe kopî kir û bi vî awayî di cihê xwe de pêşveçûn pêk nehat. Niha jî ew beşa olperest, sofî bi vê şîroveya min gelek nerazî ne, dikarin me bi vê şîroveyê bi hêsanî tekfîr bikin. Lê ez gelek bi hêvî me, hêdî hêdî be jî zanist derdikeve pêş.

Fikra olperestiyê dê têk biçê. Sedema ku li dijî dîrokê ne ew e ku dema têgihîştina dîrokê derdikeve pêş mirov zana dibin û nan ji mutesewwifan re namîne. Ew dixwazin mirov nezan bimînin da ku ji nezaniyê wan sûdê werbigirin û berjewendiyên xwe yê qirêj pêk bînin. Gelo nîqaşa vê yekê heye kî ve yekê nabîne. Bêguman her kes dibîne lê berjewendî çavê mirovan tarî dikin û êdî mirov rastiyê nikarin bibînin. Ma rewşa alema îslamê ne li ber çavan e, rengê reş bixwe her tiştî ji me re dibêje. Eger ola rast li gor armanca afirîner bihata pêkanîn, herî kêmtê di asta dinyayê de bûya, eger ne li pêş bûya jî teqez dê ne li paş bûya jî. Ev yek mirov dixwe nav fikaran ku mirov olê jî bide ber lêpirsinê. Eger ola rast neyê şîrovekirinê dê wek îro jî sedî hefteyê ciwanan bibin deîst û ji olê dûr bikevin. Sedema vê yekê ew e ku haya olperestan ji nezaniyê wan tune ye. Yanî em wiha bibêjin, pergala pîroz a Hz. Muhammed, bû qurbana nezaniyê olperestan. Di pêş de em ê bêhtir bi minakan li ser vê mijarê bisekinin, ji ber ku mijar gelek girîng û berfireh e.





Dewey Ma

Cemil Oguz

cemilo@diyname.com

Şekir

Şima hikayeya şekirî zanê? A hikayeya ke jiyana merdiman ser û bin kena. A hikayeya şekirî ke zêde biba merdimî erd ra kaş kena, kemî biba merdimî kişena...

Merdimê emir pîlî bîbî; ma nêvacin extiyarî. Erê belkî emir pîl o, la xo extiyar hîs nêkeno. Erê, ê pîlan ra henî bîbî pozîttî bî. Şa û şahî dayne dewrê xo. Înan tûtan ra zî hez kerdêne. Şekir kerdê cêbey şelwalanê xo û pê kêfê tûtan bêro şekir dayne înan. La nêzayne serî û zeman bêrê belkî o şekir zirar bido înan...

Şekirêke bîbî Amed de. Gilover bî, zerey cê qulqilî bî. Sipê bî, ser de xêzêke sûr e bîbî. Tera vatê "Şekiro qulqilî". Tûtan te ra hez kerdêne.

Şekirê bi nihan bîbî. Zere niha, teberê cê sipê, yanê şekir. Ma ew zî werdêne. Kamco tûtî şekir nêwerdo? Zehf tay, her kesî werdo. Wexto ti tût bê pirsgirêk niyo, la wexto emir beno zêde, derenceyê seran xo ro çewresinan qelebne, tam a çaxî di bedenê to de hendî pirsgirêkî xo mocnenê ra. Pirsgirêkî tewir bi tewirî. Mesela enî pirsgirêkan ra jo te ra nêweşî şekirîya. Ez jî bi nêweşî şekirî kewta. Ene hikaye hem hikayeya tûtanê ma wa, hem hikayeya min a û peynî peynî de zî çekûyanê ke ma te ra derse bigîrê xo de hebênena.

Ma nêşînê doktor, ma xo muayene nêkenê, ma nê hawnenê ka nêweşîke ma esta ya nê? La doktor ana vano, "Her teno/a emir 35 derbas bikero gere sere reyke soro qontrol." Kam şino? Qet...

Ê min tesadufî ez şiya. Xanimey mi şîne, ez zî xo dir berda û mi zî gunî da. Encam? Doktorî va: "Ti nêweşî ê?". Mi bi hewayîş va, "Sere ra?" Ê ya yarî mi fam nêkerde, ya nêwaşt cidiyet bibo vila û va, "Nê, ti nêweşî şekirîyê. Şekirê to veciyawo 303. Ti halê koma de yê, ti çawey serê lîngan de yê?" Ez zehf şaş biya. Ti nişane mi dir çînêbî...

Mi qe vîr nêberd bî ke go nêweşî şekirî mi dir veciyo û nişaneyê nêweşîyey şekirî zî hetê mi wa niyamîbî. Ez her bi herket a, la şekir veciya, nêweşî şekirî. Doktor îdia keno ke malbate de zey genetîkî nêwişeya şekirî esta. Axir nêweşî peyda bî.

Wexto merdim veyşan bo pîvaney şekirî gere di miyanê 60-115 de bo, la ê mi şîbî 303. Hîrê aşmî danê pêser û hesab kenê, geroy enî hesabî ra gere şekirê merdimî di miyanê 4-6 yan jî 6 û nîm de bo, la ê mi şîbî heta 10,8... Loma doktor şaş bîbî. Derman da min. 5 hebê tewir tewirî. Min dest pa kerd. Di hefteyan de şekir hamey nîzdê astey normalî la gere ez heban borî. Ê ez zî nêwazena heban borî. Ez bi "Dermankerdinê bê heban" bawer kena. Mi lêkolîn kerd, erê dermankerdişê ke anayîn esto. Zehmet o, la esto. Mi dest pa kerd û hîrê aşmî go dewam bikero. Bê nan, bê birinc, kartol û çîyo ke şekir tedewo... 3 aşmî...

Doktorî çende çî bîbî zî vatî, "Merdimê emrê xo yê miyanê 40-60 serî de baş derbas bikerê, baş bawnê xo ra, 60'î ra pey baştir derbas kenê.", "Şekir çîkew pîs o, gere merdim binê qontrolî de bo. Di eşkenê pîrekey xo veradê la nêşkenê şekir veradê, ew heta heta to dir."

Welhasil, peynî hikaye de ma vacin ke pêdivî pê esta her kes şoro gunî bido û xo qontrol bikero. Wexto merdim erey maneno a çaxî ax û waxe zî feyde nêdana. Şima zî bawnê ka hikayeyke senîn şima dir esto.

Welat Ramînazad

Hacimê kitabî şenik û tenik o la fonksiyon û newegeriya ey gird û xorîn o...

Bi nameyê Merhebaya Nîmeyê Şewe kitabê hikayeyanê Evdî Hesqera, emserrî, Weşanxaneyê Roşnayî ra weşanîyayo. 64 rîpel o, têde vîst û yew hebe hikayeyî estê.

Hikayeyê Evdî Hesqerayî sey kilmfilman î. Sey derhênerî o kamereya xo tadano ser karakter û meselaya xo. Kî ke hikayeyanê ey wanênî seka kî kilmfilmêka biqalîte û bibandor temaşe bikerî. Kî şîyênî no hawa zî hikayeyanê ey pênasê bikerî; seka kî filmêk de sehneyan tewr bandorkerê aye temaşe bikerî. Wendişê hikayeyêk qedino, hikayeyî de qismek, cumleyêk hîşa kî ya zeleyqeyno:

"Meaşo ke ez gêna çar qurîşî la mesref çewres û çar qurîşî! Qandê ke mîletê xwu rê medeniyetêk virazî ez ameya metropolanê şarî de girweyena, goreyê standardan cuyena(yanî zey werdê dewe ez nêşena her roce bulxur biwerî) ke ez jî mîletê xwu rê, ziwane xwu de medeniyetêko zey medeniyetê Ewropa virazî! Eke her hewte ez nêşîna tîyatro, ez yew-di kitabana nêgêna, çend filman temaşe nêkena, ez do senî medeniyet virazî bawo?! Şarê mi do medeniyeto ke ez şertanê emeleyan de virazî ra çî xêr bivîno?! Temam, tîyatroyê dewlete esto. Ez eşkêna şêrî; bîletê tîyatroyanê xisûsî ra ercanêr, çepikê ci bolêr û belaş... Kitabî zî, ez do kitabxane ra bigêrî:hîrê kitabî heqê min ê, pancês rocî wextê mi esto. Filman zî, ez do internet ra temaşe bikerî. Dublajê filmanê kalîteyan kêmî yo. Ez do binnûşte biwanî, wa çimê minê nêweşî yew rey kor bibê, ma ez se bikerî?(Ez kor nêbî, ti kor nêbê, kam do şarê ma rê medeniyet virazo?) La fina zî ez nêşena hende pere bidî arê." r.38

Hikayeyanê Evdî Hesqera de mîyanê trajedî û komedî de dengeyêk esto. No zî bi mîzah û îronî virazto. Pêro hikayeyanê ey de mîzah sey kerraya qirnî ca gêno. Bi mîzah trajedî nêdano vîr ra kerdîş û pey goşî kerdîş û kerra nêno aye ser o.Bi mîzahî hem melankolîya xesenayê hem zî bêhêvîtiya murdarkerde ra



seveknêno,şadwerî û keyfweşîya cuyî ma berz keno û bi mîzahî dano ma fikrîyayîş.

Hema hema pêro problemê ma kurdan bi bajarwanî ra têkildar î. Ma ke bajar dir dekewnî têkilîyî her çiyê ma kewno krîzî sey ziwana, kultur, ontoloji, têkilîyê komelî, kesayeti, vîro kolektîf, xobîyene û nasnameyê ma. Halî û hazirî de ziwane ma yo ke bajarana de awan bîyo çîn o. Nayê ra ziwane ma ke keweno bajarana dekewno krîzî, çekû û terman û îzafeyanê ziwane halî û hazir yê bajarî; tirkî ra gêno, no hawa xo tamam keno.

Goreyê mi edebiyatê kirdkî de newegeriya hikayeyanê Evdî Hesqera na yo: Ey bi no kitabê xo ver edebiyatê kirdkî dewe ra tadayo bajarî û seba însakerdişê edebiyatê bajarî bîngêhêk eşto. Hikayeyê ey sosyopsîkolîjîk î. Zemanê înan zî ewro yo. Wendoxî ewro ma vînenê. Hikayeyanê ey de ferd, komel û cûya bajarî esta. Nê bajarana de bedeliyayîşê komelî û ferdî nawnêno ma. Cewabê sey persanê "ferdê kurdî ha kamî hetê şonî" û "ewro komela ma bajarana de ha çî halê de ya" dano ma.

Edebîyat xovînayîş o û xo ser de fikrîyayîş o. Kî hikayeyan ey de bajarana de sosyopsîkolîjîya komel û ferdanê ma vînenî û hikayeyê ey seba

ser xo ya fikrîyayîş benî sey bîngêh û qîstasî. Erjîyêno ke kî yew bi yew ser o her hikayeyê ey de bifikirî.

Ma ke bajarana dir dekewnî têkilîyê sey ontoloji ma di felqe benî; hetêk ma dewe de maneno, dewij o, hetê binê zî hewl dano ke bibo bajarî sey mînak kî şîyênî hikayeyê "Erebeyî" bi. Hikayeyan de giranî di hetî biyayîşê ma esto. Temamkerdişê wendişê kitabî de fikro kî de virazîyêno tayê ferdî kurd bi xobîyene, pêxobawerî û serberzî bajarî bîyî.

Ziwane ma teyna bajarana de nîyî, qada internetî û teknolojiyê de zî keweno krîzî. No rey ziwane ma marûzê îngîlîzî beno. Termê îngîlîzî, farsî, erebî ziwane ma de ronîşênî, sey pîne nêasenî la ê tirkî sey pîne yî.

Evdî Hesqera, qada internet û teknolojiyê de ziwane ma de zêdnayo û hera kerdo. Ey sindorê ziwane hetê teknolojiyê, internet û bajarî ra berdo:

"Eyro zî winî bî. Ez vana "eyro" la telefon fam nêkeno, çekuya mi bedilneno keno "euro". **Raşta, her çî wextê xwu de weş bî. Ma her çiyê xwu de kewtbi erey** û teknolojiyê zî çiyêko winasî bî. Ez ništa servîsa firokxaneyî. Mi telefon akerd ke sînyal dano, vano hafîza de ca nêmend. Mi zî dest pê kerd vîdeo û fotografê ke lazîm nîyê heme pak kerdî la cîgabaytêk zî ca anêbî. Hela Hela! Mi çend

deyîrî û konferansê ke internet ra zey dosyaya vengî ardbî telefonî ser zî delete kerdî. Reyna eynî hal!" r.30

Tayê merdiman de ruhê edebiyatwanî esto. Qelemê înan ra her çiyê şîyêno bibo edebiyatî û seka bi qelma xo ruhî pûf bikerî çîyanî. Ê çîyanî binusî, tê de zewq û keyfê wendişê esto. Evdî Hesqera zî nînan ra yew o.

Evdî Hesqera tîya ra pey sebi-kero? Mi gore, ganî hîna zaf binûso.Seba ke bişo xo bivîno. Qudret, potansiyelê Evdî Hesqera ê hende zaf o ke o şîyêno sey Julio Cortazar bibo nuştoxêk. Di serrî ra verî mi bi nameyê Ötekinin Rüyası kitabê hikayeyanê Julio Cortazar wendibî, tehî û zewqêk hikayeyanê Evdî Hesqera da mi, tehî û zewqê Ötekinin Rüyası erdî mi vîrî, mi vatêne qey, ez ha newe ra Cortazar waneno. Hela ma biewnî!..

"-Ey zî xelata Nobelî heq kerda. Wulay lazîm o merdim verê verkan kitabane winî kalîteyan biwano. Mêrdêkî weş nûsto, xwu îspat kerdo û Nobel giroto. Çi yo, ma inê amatoran dest de merdbî! Qeçê ke heyatê xwu de di sey kitabî nêwendî; wendiş çî yo, di sey kitabî nêdîyê mi rê kitab nûsenê, benê nuştox! Hende bes o! Inê şaş mengî yê ke mi terkê ecemîyan kerdo. Mi..."r.19



Zîndanê Xarpêtî de tepîşteyan rê îşkence yeno kerdene

Tepîşteyê Zîndanê Xarpêtî Huseyîn Bagî pê rayîrê telefonî keyeyê xo de qisey kerd û qala binpaykerdişanê heqanê înan kerde. Bagî da zanayene ke teda û binpaykerdişê heqanê zêdîyayî, gardîyanî tim erzenê koxûşan ser û tepîşteyan rê îşkence yeno kerdene.

Keyeyî vera nê tedayan nêrazîbîyayîşê xo mojna û vat: "Îşkenceyê 2

tepîşteyan ra dima rîyê înan mîyanê gonîye de mendî. Bêsebeb hêrişê tepîşteyan yeno kerdene. Tim erzîyenê koxûşan ser û cigêrayîşî yenê kerdene. Tepîşteyê nêweşî vera nêdîyenê."

Keyeyî muracatê Komeleya Heqanê Merdiman (İHD) kerd ke wa vera nê kerdîşan têbigêra. **XARPÊT**

Dêrsimijan rê cezaya pereyî ya govenda Newroze


Komîteya Amadekariya Newroze seba şayîya Newroze ya Meydanê Seyîd Rizayî walîtiye rê muracat kerdbî la walîtiye têna seba eşkera-yîye destûr dabi.

Dêrsimijan rixmê qedexeyê walîtiye zî 21ê Adare Newroze de Mey-

danê Seyîd Rizayî de pê govendan şayîyêke virazte.

Walîtiya Dêrsimî pê bahaneyê tedbîranê vera Korona kesê ke Meydanê Seyîd Rizayî de govende giroto înan rê qasê 475 TL cezaya pereyî daye. **DÊRSIM**





Kewê Redkan

Genimê savar

Zaroktiya min çiqas xweş bû, min zaroktiyek pir xweş derbas kir. Em zarok sibê heta danê êvarê li derva, di ber derê cînarên de, li kolan û kuçeyan de kêf û eşqa herî mezin ya me bû. Em wek zarokên îro tirsonek nîn bûn, ya herî xweş, em azad bûn, xwezîya min bi wan çaxan....

Dema payizê, mal li zozanan dadiketî deştê, bav û bira û paleyan genim ji zeviyan radikirin, ew çewalên tijî genim hinek li benda arvan, hinek li benda toximê ji bo sala din, hinek jî li benda savar bûn. Beriya ku genim bibe savar, dê û xwişkên me, der û cînarên me ew genim dişuştin, zuha dikirin û dû re jî ew bi çewalên cuda cuda didan aliyekî. Ya herî ez pê kêfxweş dibûm, şuştina genim, raxistina li ber tavê, genimê kelandî û dû re jî çêkirina savarê.

Heçî gava genimê savar dişuştin, min dor nedida kesekî, min digot ez ê li ber genimê savar bisekinim û bila çûkên hewa neyên nexwin. Jixwe diya min ji min re sibani çêdikir sewa ku ew tav min gêj neke, lê xema min nîn bû.

Dîsa di wan rojan de hemû jin genimê xwe di nînin ber avê, pêşiya çem bi çend keviran ve dibirîn, carcîmeke mezin li binê avê radixistin, pêda pêda ew çewalên geniman berî nav avê didan, bi destan diketin nav û dişuştin. Hinek ji wan ew genimê şuştî li ber tavê radixistin. Jixwe her tim ez li ber çavên wan wenda nedibûm. Wana hemû genimê xwe şuştin, li ber tavê raxistin, şerbîkek av, nanekî zirav di nav de mastê bi şorbeşîr û ez damê li ber genimê savar û hemû kes çûn malên xwe. Ez li ber genimê savar mam, li der û dora genim diçim û tîm, carna serobinî hev dikim ku sewa aliye din jî zuha bibe. Heta çendekê min wisa parastina genimê savar kir, dû re nayê bîra min çawa bû, lê ez ketime xeweke giran û şêrîn, dibe ku wê tava payizê jî ez gêj kiribûm û hişê min ji serê min diçû, nizanîm. Dû re min çavên xwe vekir, ez li malê di nav ciya de me, diya min digirî, şerekî giran li ser bavê min kiriye, wêlê û hewara wê ye.

Piştî çendekî ez bi ser xwe ve hatim, pirsna min a yekê û bigirî; we hemû genimê savar xwar? We qet para min nehişt? Min dest bi girî kir, min dî diya min beroşek genimê savar kelandî ye û şîr jî kiriye nav danî ber min. Got; eva beroşa para te ye, ger tu vî genimê kelandî bixwî edî heta hetayê tiştê bi te nayê. Min xwar, lê wê carê jî şîr û genim ez nexwaş xistim. Xwezîla min a zaroktiya min a wan deman. Ger her sal ez genimê savar nekelînim sebra min nayê. Zaroktiya min tîne bîra min.

Tiştanok (mamik)



Yê hatî nînin
De bêjin ew çi ye?

2- Tiştêk min heye
Çav spehî ye
Dil nazik e
Çar ling e
Ne ker e

3- Tiştêk heye
Çav nîne bi rê ve diçe
Ling nîne dewse di hêlê
Ev çi ye?

Çavkanî: Mamikên Botanê
Berhevkar: Rênas Xendekî û Dildar Botî

Me dîsa ji we re çend tiştanok ango mamikên xweş amade kirine. Bi hêvî me ku bi dilê we be. Her wiha em dixwazin hûn ji kerema xwe tiştên li ba xwe binivîsin û ji me re rêkin da ku em wan jî biweşînin di rojnameyê de.

1- Tiştêk min heye
Mamê Mino mamani
Sûka wê mezin e
Bazar pê re nabe
Yê diçinê zêde ne

Bersivên me ev in:

1-Gorîstan 2-Xezal 3-Derzî

Zûgotinok

Îro dîsa di tûrikê me de çend zûgotinok hene û em ê dîsa bi we hêjayan re par ve bikin.

De werin em dest pê bikin û pirsna xwe ya her tim bipirsin.

→ Gelo kî dikare 3 caran li pey hev bêje:

Ûsivê Îso mamê Ûsiv
Sê pêncşemê
Sê mişar sîr
Li Şemsê çandin

→ Heke nikaribî wê bêjî ka wê biceribîne:


Tûsika min a serbimêstê
Xewnê mala bavê te
Ji berê de tim rast tê

→ Heke ew jî nebû dê ji sedî sed ev çêbibe:

Vir rûn e, vir rûnê

Çavkanî: Pirtûka zûgotinokan a Mihemedê Kurdo

XAÇEPIRS



JI ÇEPÊ BER BI RASTÊ

- Piştî, tiştê ku mirov hildigire 3. Rêveberê mîrîtiyê 5. Jor
- Fayiz, deynkirina pereyên bi karekî zêde 7. Milk û hebûnên mirov
- Navê herêma û çiyayekî kurdan li Ermenistanê 12. Porê hûnandî
- Cihê ku genim lê tê hêran 15. Navê teyrikên ku di ayeteke quranê de derbas dibe
- Kurtebêja galyûmê. Her wiha navê sewalekî kedî ye
- Xwedawendekî Misrê yê kevin 22. Paytexta Ermenistanê

JI JOR BER BI JÊR

- Hiş 2. Pereyên Rûsyayê
- Sewaleke kedî ku ji goşt û hiriya wê tê sûdwegirtin
- Noteke muzîkê
- Bilind, aşkera
- Milyaketê ku wekî berpîrsê xwezayê tê naskirin
- Ecele, meşa sivik
- Beden, cesed
- Fedî, hijmetkarî
- Kirê
- Zimanê Afganistanê
- Aramî, hêminî
- Arvan, genimê hêrayî
- Îbadetxaneya xiristiyanan
- Rojê heftayê
- Daçekeke alîkar

Bersiva heftaya borî



'Em ê kampanyaya ziman bigihînin serkeftinê'

Navenda Nûçeyan

Di 22'ê sibatê de ji bo ku zimanê kurdî bibe zimanê fermî û perwerdeyê ji alî Tora Ziman û Çanda Kurdî û Platforma Zimanê Kurdî ve kampanyaya îmzeyan hat destpêkirin. Kampanya hem bi awayê online hem jî bi detnîvîsî tê birêbirin.

Têkildarî xebatên kampanyaya ziman, parlamenterê HDP'ê Îmam Taşçier bersiv dan pirsên me. Taşçier diyar kir ku wan di demêke pir dijwar de dest bi vê xebatê kiriyê ku zext, zor, qedexê û astengkarî li ser zimanê kurdî tê meşandin û wiha got: "Bi rastî jî me ev kampanya di demêke wisa de da destpêkirin ku îro em dibînin dewlet bi hemû hêza xwe êrîşî zimanê kurdî dibe. Daxwaza fermiyeta ziman nas nake, perwerdeya zimanê kurdî qebûl nake. Yanî mirov dikare bibêje ku îro dewlet çawa nêzîkî kurdan dibe, dîsa bi heman rengî nêzîkî zimanê kurdî jî dibe."

'Motivasyon û kelecana hêzê dide me'

Parlamenterê HDP'ê Îmam Taşçier destnîşan kir ku ligel gelek kêmasiyên xebatên kampanyayê bi awayekî çalak didomin û wiha pê de çû: "Hem Platforma Zimanê Kurdî hem Tora Ziman û Çanda Kurdî û hem jî partiya me bi hemû hêz û

derfetên xwe hewl didin ku kampanyayê bigihînin qonaxa serfiraziyê. Ji bilî wê, li Ewropa û temami dîspora yê jî ji bo ku kampanya bi ser bikeve, xebatên xwe dimêşînin. Em jî xebat, hewldan û kampanyayê bi hêvî ne. Motivasyon û

kelecana ku îro didome, hêzê dide me jî. Di vê pêvajoyê de em hem kêmasiyên xwe dibînin hem jî potansiyela xwe. Ji ber ku wisa xuya ye, di demên pêş de em ê zêdetir mijara ziman, xwedîderketina li ziman bikin rojê xwe. Çimkî êrîş gelek zêde ne û em jî ji ber êrîşên li ser kurdî, xwe berpirsyar dibînin ku rê li ber vê yekê bigirin."

Hejmara îmzeyên hatine komkirin

Taşçier ragihand ku hejmara ku wan weke hedefekê daniye pêşîya xwe hîn nehateyê komkirin û ev tişt anî ziman: "Di vir de gelek faktor hene, lê helbet ev rastiyên din nîşanî me dide ku em zêdetir bixebitin û bigihîjin armanca xwe. Heta niha bi awayekî online me 20 hezar îmze kom kirine, lê bi destî ango bi awayekî matbû hejmara îmzeyên ku me kom kirine hîn ne diyar e. Ji ber ku em hem di çalakiyên xwe de û hem di kongre, meş û konferansên xwe de jî îmzeyan kom dikin. Lê me hîn muhasebeyê geşî der barê encama wan de dernexistîye. Çimkî ev kampanya

Parlamenter Îmam Taşçier ku têkildarî kampanyaya ku ji bo ziman hatiye destpêkirin axivî, diyar kir ku kampanyaya wan bi çalak didome û got ku armanca wan bi milyonan îmzeyan e

dê hîn bidome û di pêşerojê de kampanyayên me yê medyaya civakî û hevdiştinê de ji bo bihêzkirina wê bîn kirin. Loma em niha nikarin hejmara geşî ya îmzeyên online û destî bidin."

Armanca bi milyonan îmze ne

Di axaftina xwe de Taşçier diyar kir ku wan hejmareke mezin wek hedef danîye pêşîya xwe û wiha nirxand: "Em tenê ne ji kurdan jî kesên ne kurd in jî daxwaza alîkariyê dikin, bo bihêzkirina kampanyayê. Armanca me bi sedhezaran heta bi milyonan îmzeyan e. Ji bo ku em bigihîjin vê armancê, niha gelek têkiliyên me bi nivîskar, rewşenbîr, sazî, dezgeh, hunermend, partiyên siyasî re hene. Em dixwazin vê hewldana ji bo kurdî, bi hemû pêkhatiyên civakî re bi pêş bixin û bi encama vê kampanyayê zextê li hikûmetê bikin ku zimanê kurdî nas bike û perwerdeya bi zimanê kurdî misoger bibe."

Rê û rêbazên xebatê

Taşçier herî dawî bal kişand ser girîngiya mijara zimanê kurdî û axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Meseleya kurdî ne tenê meseleyeke zimanî yan çandî ye. Em baş dizanin ku îro pêdiviya kurdan, siyaseta kurdan, sazî û dezgehên kurdan bi amadekirina plansaziyeke zimanî heye ku bikaribin zimanê kurdî ji aşê hêrandin û bişafîtinê biparêze. Ji bo vê yekê jî xe-

batên piralî û berfireh ji me re pêwîst in. Ev kampanya jî tenê aliyek û parçeyek ve plansaziyeke ye. Em xebatên ji bo zimanê kurdî tenê bi vê kampanyayê ve sînor dan nakin. Ji bo ku em wek partiyên kurdan, sazî û dezgeh, tor û platform bikaribin di

vê sedsalê de statuyekê ji kurdî re bi dest bixin, xebatên me dê bi bawerî bîdomin. Ji Kurdistanê heta Tirkiyeyê, ji sazîyên kurdan heta dezgehên navneteweyî em ê her rê û rêbazî ji bo zimanê kurdî bi kar bînin."



Keremê keremdar, Seyadê dilê guhdaran bû!

Kakşar Oremar

Dengê wî qet ji bîra min naçe: "Yêrîvan xeber dide...". Dilê wî tije kerem û dengê wî nêçîrvanê hestên germ bû. Şahidekî zindî yê dîroka 50 salên derbasbûyî bû mamoste Kerem. Di rojên xweş de xebatkarê doza rewşenbîriya kurdî bû. Bi dehan zana û nivîskar, dengbêj û hunermendên kurd bi rêya wî ketin studyoya radyoya Êrîvanê: axivîn, stran û newayên xwe li hemû Kurdistanê belav kirin. Rêya Teze bi gotarên wî dewlemendiya çanda me kir malê dîrokê.

Hunera herî mezin a mamoste Keremê Seyad hingî aşkera bû dema ku sistema sosyalîst hilweşîya, komarên nû ava bûn, jiyana ketî kirasê nexweşiyên mezin û astengiyên aborî roj ji rojê zêdetir bûn, lê wî nehişt ku deriyê Radyoya Kurdî a Rewanê bê dadan. Tevî keç û kurê xwe di tengasiyên herî dijwar de dema ku piraniya xebatkarên radyoyê ji wê navendê dûr ketin û ketin pey jiyana xwe ya şexsî, şev û rojên xwe kirin yek û deriyê fonda zêrîn a radyoya kurdî vekirî hiştin. Ew mêrê rojên tengav bû. Qada xebatê di şertên herî dijwar de neterikand û bi awayekî dûrbînanê dizanî ku rojên xweş jî dê bîn.

Mamoste Seyad di karê xwe de nivîskarekî pîspor, kesekî kurdhez, xwedî ramanên kurdistanî û heya dawiyê jî fedakar bû. Li dijî kesên ku dixwestin kurdên êzdî û misilman ji hev cuda bikin, sekinî û bi belgeyên cihê baweriyê û dîrokî planên wan ên

qirêj pûç kirin.

Ragihandin û cîhana rewşenbîriya kurdî de tim deyndarê ked û pênuşa zêrîn a mamoste Kerem Seyad be.

Serê malbatê, kekê min ê hêja Tîtalê Kerem û evîndarên doza wî ya tije ked û xebatên bêmirin sax be.

Em ê li pey şopa mamoste Keremê Seyad doza wî berdewan bikin.

Têbînî: Min berî çend salan hevpeyivînek bi mamoste Kerem Seyad re çêkiriye û di demêke nêz de ez ê li ser kar bikim û dê li Stêrk TV bê weşandin.



Temaya mîhrîcanê 'Kurdistan Min' e

Mîhrîcana Filmên Kurdî ya Londonê (FFKL) bi piştgiriya Enstîtûya Filmên Brîtanî (BFI), Tora Temeşevanên Filman (FAN), National Lottery, Nûnerîya Hikûmeta Herêmî ya Kurdistanê-UK û Meclisa Kurdî ya Demokratîk ya Brîtanîyayê, festîvala xwe ya 12'ê emîn li dar dixê.

Mîhrîcanê de di navbera 16-27'ê nîsana 2021'ê de bê lidarxistin û filmên di bernameyê de ji ber rewşa pandemiyeke de bi awayekî online bînin nîşandan. Her wiha li her deverê cîhanê her kes dê bikaribe bê pere li filman temaşê bike.

Temaya mîhrîcanê bin navê 'Kurdistan Min' hatiye destnîşankirin. FFKL bi vê bernameya xwe hewl dide ku pêşketina di van salên dawî de, di sinemaya kurdî de çêbûye û hunera heyî ya kurdî bi temaşevanên sinemayê re parve bike û balê bikişîne ser sinemaya kurdî.

Her wiha di festîvalê de, du komên jûriyê de ji bo filmên bernameya Filmên Nû yê Hilbijartî pêşbirkêkê çêbikin û filman hilbijêrin û xelatên pêşbirkê bidin. Xelatên ku dê bînin dayîn ev in:

-ROJAZER Xelata Baştirîn Filma Metraj Dirêj

-Xelata Baştirîn Belgefilma Mehmet Aksoy

-Xelata Baştirîn Kurtefilma Yilmaz Guney

-Xelata Rûmetê ya FFKL

-Xelata Baştirîn Belgefilma Kurt

-Xelata Baştirîn Lîstîkvana Jin

-Xelata Baştirîn Lîstîkvane Mêr

Komîteyê jî bo mîhrîcanê xelateke nû diyar kiriyê û li gorî vê yekê, temaşevanên filman ji bo bikaribin Filmên Baştirîn yê Sinemaya Kurdî hilbijêrin dê bikaribin dengê xwe ji bo filman bidin.

LONDON

Mîhrîcana Yekta Herekol bi dawî bû

Her sal bi pêşengtiya Tevgera Çand û Hunera Demokratîk a Mezopotamyayê û Desteya Çandê Mîhrîcana Şehîd Yekta Herekol a şanoyê tê li darxisitn. Di sala 2020'î de ji ber rewşa vîrûsa koronayê mîhrîcan nehat lidarxistin, lê îsal 5'emîn mîhrîcana şanoyê bi dirûşma 'Qêrîna Waşokanî' di 27'ê adarê de li navenda Çand û Hunera Mihemed Şêxo ya Qamişloyê hat lidarxistin. 9 komên şanoyê ji tevahî bajarên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê bi berhem û hunera xwe beşdarî mîhrîcanê bûn ku heya 6'ê nîsanê dewam kir.

Herî dawiyê jî rêzeşanoyên bi navê 'Aştî di baskên teyran de ye' li ser dîka Şanoya Mihemed Şêxo ya Çand û Hu-

nerê hat pêşandan. Lîstîkvanên şanoyê yê ji koma şanoyê ya Teatra Sarya Baran a Qamişloyê tev li vê şanoyê bûn. Şano ji aliyê derhêner Sarya Golan û nivîskar Cola Folia Yuksel ve hatiye nivîsin û niv seat berdewan kir.


Lîstîka 'Aştî di baskên teyran de ye' bi vê lîstîkê xwestiye ku peyameke aştiyê bi rêya vê şanoyê jî cîhanê re parve bike. Her wiha di naveroka şanoyê de bal kişandine ser bandora şer a li ser zarokan, li ser jîngehan a mîna şewitandina daristan û daran.

Mîhrîcana Şehîd Yekta Herekol lîstîka xwe ya herî dawî bi koma şanoyê ya Heseke, bi navê 'Venasin' hat pêşandan.

QAMIŞLO



Maqûlên welatê jorîn³



Keştiya Alalû
Agît Yazar

Qral Sardûriyê kurê Argîştî dibêje:
“Gava ez li ser textê bavê xwe yê qiralyetê rûniştim, min ji bo yezdan Îrmûşînî peresteghekek da avakirin.” Sardûrî dibêje: “Erd qeraç, çol û beyar bû. Li wir ti tişt lê çenedibû. Min li wê derê peresteghekek ji bo yezdan Xaldî û kela-teke zexm da avakirin. Min ji çemê Gûgûnayê coavek da kolandin. Min li wir rez, bexçe û bajarekî nû da çêkirin. Min avahiye zexm avakirin. Min navê Sardûrhînîlî li wî bajarî kir.” Sardûrî dibêje: “Bi quwet û îzna yezdan Xaldî, min ev avahî tevdek ji bo xatirê bavê xwe Argîştî çêkirin.”

“Argîştîyê bavê min qral û ferman-darekî ew çend mezin bû, bi salan li Tûşbayê li ser textê qraliyetê rûnişt. Van avahiye min ew çêkirine, lê miqate bin. Kesên wan birûxînin û ziyane bidinê, bila xezeba yezdan Xaldî bi ser wan de bibare. Bila yezdan Xaldî, jiyana mezinahî û desthilatiyê bide Sardûriyê kurê Argîştî. Bi saya yezdan Xaldî, Sardûrî qralê mezin, qralê bihêz, qralê welatê Bîanîliya û lehengê bajarê Tûşbayê.”

Qral Sardûriyê 2'yemîn bi van gotinan me pêşwazî dike. Min jî xwest ez bi van gotinên liyaqî devê qralekî dest bi gotarê bikim.

Ev bajarê hanê yê mijara gotinê, bi sê navan tê naskirin: Sardûrhînîlî, Aspava û hespê şîn. Her qralekî Xaltî-Ûrartûyan bajarek ava dikir, paşgira “hînîlî” datanî li pişt navê xwe û navê xwe li wî bajarî dikirin. Wek nimûne: Argîştî-hînîlî, Sardûrî-hînîlî, Rûşa-hînîlî. Navê duyem Aspava ye. Asp, ango hesp. Ava jî jixwe ava ye. Navê sêyemîn jî Hespêşîn e. Ango tê wateya “hespê şîn”

Navê Sardûrhînîlî jixwe tê fêmkirin. Lê dibe ku hûn bibêjin êdî ev navê “aspava, hespêşîn” ji ku tê? Belê hûn ge-

lekî mafdar in.

Ev bajarê hanê 25 km dûrî navenda Wanê, li navçeya Payizavayê ye. Gava meriv ji Wanê diçe Colemêrgê, hema bi qasî 300 metreyî li milê rastê dikeve. Bajar, li ser rêzeçiyayekî li naverastê hatiye avakirin. Çiya, ji rojhilat ber bi rojava ve ji sê girên tûjik pêk tê. Ger meriv ji dûr ve li wan her sê girên bi hev ve binêre, ji kêlekê nola hespekî dixuyê. Nexasim gava dibe bihar û xweza kirasekî kipîkesk di ser bejna xwe de berdide, tu dibêjî qey hespekî di rengê biharê de, li wê naverasta deşta Xavsorê ji xwe re diçêre. Wateya her du navan ji wê yekê tê.

Tirk jî ji wî bajarê hanê re dibêjin “çavuştepe”. De ka gelo çî eleqeya wî navê “çavuştepe” bi van her sê navên min li jorê destnîşan kiriye, heye?

Aspava

Min di beşên berê de jî qalê kiribû ku qral Sardûriyê 2'yemîn qralê welatê Xalta yê herî serkeftî bûye. Di dema qral Sardûriyê 22'yemîn de, rewşa xweşguzariyê yê welatê Xalta derdikeve radeya herî rajor. Sardûriyê 2'yemîn her çar aliyê welatê xwe li hember êrîşên derve misoger dike.

Sardûriyê 2'yemîn bi wê mebestê bajarê Aspava ava dike, da ku êrîşên Asûrên xwînrij ên muhtemel ji hêla rojhilat ve pêk werin, wan li deşta Xavsorê rawestînin û Asûran li wir têk bibin. Loma jî bajarekî gelekî mezin ê zornebir ava dike.

Gava meriv derdikeve ser pişt, serî

û dûvê “hesp”ê avahiye dîrokî derdikevin pêşberî meriv. Ji wan avahiyan peresteghekek li ser navê yezdan Xaldî, yek jî li ser navê yezdan Îrmûşînî hatiye nezirkirin û avakirin. Yezdan Îrmûşînî, yezdanê herêmî yê wî bajarî ye. Perestegheha yezdan Xaldî ji zinarekî mezin kolane û berê peresteghê li hêla rojava dinêre. Ji kaviên peresteghê eyan e, di wexta xwe de mabedeke muhteşem bûye.

Herçî perestegheha li ser navê yezdanê herêmî, yezdan Îrmûşînî hatiye nezirkirin jî, ew perestegheke biçûk lê gelekî xweşik e. Li ser diwarê peresteghê kitabeyên ji nivîsên mîxîl pêk tê hatine bicihkirin. Di kitabeyê de çî tê gotin, ji devê qral Sardûriyê 2'yemîn me li jorê dest bi wê gotara xwe kiriye.

Avahîsazî

Li ber hewşa persteghê hêla bakur, kevirêkî qul tê dîtin. Ew kevirê qul, cihê ajal ji yezdanan re lê dihatin gorîkirin û serjêkirin. Ji bo xwîna wê ajala dihat gorîkirin tev erda ne paqij nebe, coavek ji tahtê kolandine û xwîna wan arasteyî devereke taybet kirine. Gelekî eyan e ku wan ew yeka hanê bi dîrokeke olî û rêûresmên fermî pêk anîne.

Kevirên diwarê keleh û avahiye li hêla rojavayê bajarê Aspava, meriv ji xwe re bengî dihêle. Ew çend kevir bê-qusûr birrîne, milîm ji ser hev şaş nebûne. Meriv dibêje qey bi lazerê ew kevirên mermer wanî rast birîne û li

hevdu edilandine. Ev hunera wan a kevirbirîne, hêjayî pesindayîne ye.

Hinek avahiye Aspava jî bi kerpîçên heriyê lêkirine. Ev avahiye hanê jî heta tu bibêjî erê, bêqusûr in. Avahiye ji wan avahiye ji kerpîçên heriyê hatiye dîtin, embara dexil û zexîreyê ye. Di wê embarê de, kewar û kûpên dê-wasa di ber hev de hatine danîn. Hin ji wan ên dexil, hinek jî yên şerab û yên rûnê kunciyane e.

Di nav kelehê de, embarên ava vexwarîne yên gelekî mezin jî hatine dîtin. Ev embarên avê li hêla rojavayê kelehê dikevin. Her wiha qesra bajêr jî, tevî kompleksa xwe li derdora van embarên avê hatiye avakirin. Di navbera perestegheha yezdan Îrmûşînî û qesrê de, korîdoreke ji tahtê hatiye kolan bi qasî dirêjahiya 200 metreyî heye. Ev korîdora miqîm ji tahtê hatiye kolandin, bilindahiya wê cîcîna bi ser bejna meriv dikeve.

Tiştê herî zêde bala min kişand, kevirê daşirê yê nola kevirê altûrka bû. Hela carekê bidin bala xwe! Ev serê du hezar û 800 sal beriya niha, pêşiyên me li ser kêzîne, daşir çêkirine û qirêja xwe derxistine derveyî malên xwe.

Çiqas şan û şerefeke mezin e. Pêşiyên me yên Xaltî-Ûratûyî, di paqijiyê de jî serkêşî ji mirovahiyê re kiriye. Pirsê divê em ji xwe bipirsîn ev e: gelo çî bi me hat em piştî du hezar û 800 salên

din, îroj em di xaniyên jihevda ketî de dijîn? Pêşiyên me sê hezar sal berê tewaleûtê bi qenalîzasyon çêkirine. Lê heta 15-20 sal berê jî li gundan tewaleût tîne bû. Hîn jî li gelek gundên Kurdistanê xweşik tewaleût tîne ye.

Genim, ceh, nîsk, nok...

Dijmin em ew çend şêr û gêj kirine, ji erd heta ezman em ji rastiya xwe bi dûr ketine. Kijan tiştê nebaş be hemû li kurdan kirine mal. Yên baş jî li dijmin kirine mal. Li ser meselê, çêlekek nebaş be, lawaz be, kêmsîr be, cinî be ango dînomîno be, jê re digotin çêleka kurmançî. Genimê kurmançî; nizanîm dîkê kurmançî û hwd...

Gelo ew bû çî! Çawa çêdibe? Yên ku di jiyana mirovahiyê de cara ewil çêlek, mîh, bizin, beraz, hesp dermale û kedî kirin kurd bin, mirovahî bi xêra kurdan ji şîr, hîrî, post û goştên wan sûde werbigirin, çawa di roja îroj de tenê yên nebaş bibin para kurdan?!

Cara ewil yên simbilên genim, ceh, şolik, nîsk û nokan li derdora çiyayê Qerejdaxê kifş kirin pêşiyên kurdan bûn. Wan pêşiyên me ew simbilên genim, ceh, şolik, nîsk û nokan frîdandin û birin di axa Kurdistanê ya bi xêr û ber de çandin, pêşiyên me bûn. Lê çima genimên nebaş bibin genimê kurmançî?! Tew ne kurd jî! Digotin filan tişt yê “kurmançî” ye. Ne kurd jî, kurmançî(!)

‘Hatîn ji newalê bûn xwediyê malê’

Di hêla avahîsaziyê de jî heman tişt derbasdar e: malên ewil, peresteghên ewil, kelatên ewil, gund û bajarên ewil pêşiyên me ew ava kirine. Pêşiyên me kurdan, xelkên cîran anîne nav xwe û ew di lêkirina van avahiyan de dane xebitandin.

Bi wî awayî ew xelkên cîran jî ji pêşiyên me hînî sewalvanî, cotkarî û mîmarîyê bûn. Lê bextê reş! Hûn bibînin di roja îroj de 50 milyon kurd bê pergal, bê welat û bê azadî dijîn!

Gotinek me kurdan heye, dibêje: hatin ji newalê, bûn xwediyên malê!

